

BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ★ Sal: 5 Hejmar 5/86 (37)



BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê

Berpirsyar:

Hanefî Celeplî

Berpirsyarê redaksiyonê:

Sedat Anter

Endamên redaksiyonê:

Mihemed Bekir, J. Kurdo,

Reşîd Simo, Reşo Zilan

Pergela Rûpelan û rêzkirin:

Broyê Macîr

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet

Ansvarig utgivare:

Hanefî Celeplî

Ansvarig för redaktionen

Sedat Anter

Redaktion:

Mihemed Bekir, J. Kurdo,

Reşîd Simo, Reşo Zilan

Layout och sättning:

Broyê Macîr

Navnîşan / Adress:

BOX 45205

104 30 Stockholm

Navnîşana seredanê / Besöksadress:

Hornsgatan 80, 1tr. Stockholm.

Telefon:

08/68 60 60

Postgiro:

64 38 80 — 8

Abonetî / prenumerationer:

Kes / Enskilda 100 Skr./sal-år

Maqam / Myndigheter 200 Skr./sal-år

Îlan / Annonc:

Bergê paşîn / Baksida 2000 Skr.

Rûpelên navîn / Insidor 1000 Skr.

Nivîrûpel / Halva sidan 500 Skr.

ISSN — 0281 — 5699

Redaksiyon ne berpirsyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ji Berbangê re tên şandin, heke çap ji nebin, lixwedî nayên vege-randin.

NAVEROK

Terora Hukumata Tirk.....	3
Dijminê bêbext.....	6
	Diljar Bêwar
Cunta Faşîst.....	7
Hawar	8
	Mihemed Bekir
Festîvala Kurdî.....	12
Zimanê Zikmakî.....	15
	Bareş Battê
Bîranîna Yilmaz Güney.....	16
Ji Komelên Endam.....	18
Berbang Zarokan.....	20

Ji xwendevanên Berbangê re

Ev hejmara ku dikeve destê we, bê goman gele-kî dereng ket. Sedema dereng ketina vê hejmarê ev bû, ku tev endamên redaksiyona Berbangê ji ber sedemên têvel îstifa kirin. Sazkirina redaksi-yoneke nû gelek wext girt. Herweha di orta xe-bata hazirkirina vê hejmarê de, makîna rêzkirinê xirab bû. Hinek wext ji vê yekê girt.

Em ji redaksiyona nû re serketinê dixwazin û hêvî dikin ku ji vir pêve Berbang wê di wextê xwe de derkeve.

Gazinek me ji xwendevanan heye. Bi hejma-ra berê re me ji aboneyên Berbangê re namek nivî-sandi bû û tika kiribû ku aboneyên Berbangê heqê xwe yê abonetiye bişînin. Heta niha gelek abone-yan heqê xwe yê abonetiye şandine, bes hinekan ji li ser çêkê pera navê xwe ne nivîsîne. Em niza-nin ew kî ne. Em ji wan hevalên dilsoz tika dikin ku ji me re namekê bişînin û di nama xwe de diyar bikin wekî navê wan çî ye û wana ji kîjan bajarê ew pere şandine.

Herweha em ji xwendevanên ku hîn abonetiya xwe neşandine tika dikin ku heqê abonetiya xwe bişînin.

Em li benda nivîsar, nûçe û wêneyên we ne. Ser-firaziya Berbangê, serfiraziya xwendevanên wê ne.

Sedat Anter**Bergê pêşîn:**

Meşa Protestoyê - Uppsala Stockholm

Foto: Kiki Lundgren

Bergê paşîn:

Siyabend û Xecê

Hunermend: Anton Mîrzoew

Sal: 5 Hejmar: 5/86 (37) 4.11.1986

TERORA HUKUMATA TIRK LI DIJ GELÊ KURD HATE PROTESTO KIRIN



Hukumata tirk ya faşîst, terora dewletê li dij neteweyê kurd her diçe giran dike. Roja 15.8.1986-a balafirên leşkerî yên ordiya Tirkîyê êrişê-ke giran birin ser axa Kurdistanê Ira-qê. Ev êrişê ne cara yekê e. Piştî

peymana ku di navbera hukumatên Tirkîye û Iraqê de di sala 1982-an de hate îmzekirin, leşkerê tirk gelek caran êrişê bîre ser Kurdistanê Iraqê û gundên kurdan bombebaran kirin. Di neticeyê van êrişan de her tim xel-

kê sîvîl zirar dîtiye. Gelek mirovên bê-mudafa; zarok, jin, kal û pîr hatine kuştin, xaniyên gundiyan hatine hilweşandin û zeviyên wan hatine sewitandin. Di vê êrişê leşkerê Tirkîye ya dawî de jî xelkê sîvîl zirar dîti-

RESOLUTION

Roja 15.8.1986-an balafirên leşkerî yên Tirkîyê, li Kurdistanê Iraqê, di mîntîqa Şîrwanê de gundên kurdan bombebaran kirin. Herdu rojên pey-wê jî li mîntîqa Zaxo gundên kurdan bombebaran kirin.

Angorî agahdariyên ku gihane me, piştî wan bombebaranên terorî gelek mirov hatine kuştin. Pîraniya wan jî mirovên bê-mudafa; jin, zarok û kal û pîr in. Herweha bombebaranê zira-ke mezin a mîrcyalê jî gihandîye gundiyan; xaniyên wan hatine hilweşandin û zeviyên wan jî hatine sewitandin.

Armanca van êrişên terorîstî pelixandina tevgera gelê kurd a ji bo mafên mirovatî, demokratîk û netewî ye. Ev yeka li dijî prênîsîbên pey-

manên navnetewî ne ku mafê gelan diparêzin û binê kîjanan hukumatên Tirkîyê û Iraqê jî îmze kirine.

Hukumata Tirkîyê ya faşîst, vê êrişê hov di çarçova peymana ku di navbera Tirkîyê û Iraqê de, di sala 1986-an de hatibû îmzekirin, îzah dike. Navaroka vê peymanê li ser şerê gelku jî e, ku Tirkîyê û Iraqê li dijî gelê kurd didomînin.

Nûnerên hukumatên bi nefret yê Ankara û Baxdadê!

Hûnê nikaribin bighên armancên xwe;

Gelê kurd wê têkoşîna xwe bidomîne, ta ku ew jî wek gelên din bighê azadiya xwe.

Têkoşîna gel naye hilweşandin; ê ku wê bê hilweşandin, rêjimên we yê faşîst in.

— Em hukumatên we mahkum

dikin!

— Em peymana we ya nemirovî mahkum dikin!

— Em êrişên we yê terorîstî mahkum dikin!

-BIJ TÊKOŞINA GELE KURD JI BO AZADIYÊ!

Ala Rîzgârî, CUD (Eniya Welatparêzên Iraqê), Devrimci İşçi (Karkerê Şoreşger), KIP (Partiya Karkerên Kurdistanê)-liqê Swêd, KAWA, KUK -Baskê Sosyalist, Partiya Demokratîkê Kurdên Pêşverû Li Sûriyê, Partiya Hevgerîna Gelê Kurd Li Sûriyê, Partîzan, Rîzgârî, Têkoşîn -liqê Swêd, Tevgera Sosyalist A Kurdistanê, TKP-B (Partiya Komünist A Tirkîye -Yekîtî)-liqê Swêd, TUDEH, Yekîtiya Nîstîmanî Kurdistan, Yekîtiya Sosyalist A Kurdistan, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê.

ye û li gor malûmatên rojnamên navnetewî dora 300 kesî hatiye kuştin.

Çawa xebera vê êrişa hov hate bîhistin, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê, bi belavokeke bi zimanê swêdî di roja 16.8.1986-an de hukumata Tirkîye û Iraqê protesto kir û xelkê swêdî ji vê erîşa hov agahdar kir. Herweha Federasyonê telegrafeke protestoyê ji serecumhûrê Tirkîyê, general Kenan Evren re û namek jî ji hukumata Swêd re, ji bo ku erîşa Tirkîyê protesto bikin, şand. Herweha Federasyonê bîryar da ku li dijî sefaretên Tirkîyê û Iraqê li Stokholmê meşeke protestoyê di roja 23.8.1986-an de amede bike. Hemû rêxistinên tirk, ereb, ecm, kurd ji meşa protestoyê hatin agahdar kirin. Komelên endamên Federasyonê yên di wîlayeta Stokholmê de, çar rojan berî meşê li taxên Stokholmê û navça Stokholmê bandrol vekirin û bolavoka Federasyonê li xelkê belav kirin. Belavoka Federasyonê li bajarên Bollnäsê, Söderhamnê, Uppsalayê û Sundsvälê jî ji aliya komelên kurd de hate belavkirin.

Civîna meşa protestoyê di roja 23.8.1986-a seet 12.00 de li navça Stokholmê, li Sergelstorg civiya. Li Uppsalayê jî endamên Komela Kurdistanê rojekê berê, meşeke protestoyê ji Uppsalayê heta Stokholmê destpêkiribûn. Beşdarên meşê -61 kes, 8 ji wan jin- piştî 25 seet rêçûnê di bin baran û sermê de, gihan Sergelstorg û tevî meşa Federasyonê bûn. Grûbek



Oswald Söderqvist

multeciyên kurd jî ji bajarê Flen tevî bandrola xwe hatibûn.

Di civîna li Sergelstorgê de, serokê Federasyonê, Hanefî Celeplî li dijî siyaseta hukumatên Tirkîyê û Iraqê axaftinek kir. Parlementerê Partiya

Çep ya Komûnîstan, Oswald Söderqvist jî li ser daxwaza Federasyonê di civînê de axaftinek kir û hukumatên Tirkîyê û Iraqê rûreş kirin. Herweha Oswald Söderqvist diyar kir ku ewê di parlamentoya Swêdê de li ser vê êri-

şa hov munaqesekê veke û bixwaze ku hukumeta Swêdê Tirkîyê û Iraqê protesto bike. Nunerekî Eniya Welatparêzên Iraqê (CUD) jî axaftinek li dijî rêjîmên Tirkîyê û Iraqê kir.

Seet 13.00 de meşê berbi sefaretên



Ji axaftina serokê federasyonê

Bi dehan salin ku ev rêjîmana dixwazin tevgera netewî yê kurd bişkênin. Lê di her carê de daxwaza wan bi cih ne hatiye. Ji ber ku tevgera netewiyê kurd her ku diçê mezin dibe û piştigiriya hêzên xebatkar distîne. Dijmin jî ev yeka têgihîştîye û lewra jî roj bi roj erîşên xwe zêde dike. Di van rojên dawî de, erîşên dijminê hov gihan derecên bilind. Di panzdehê Tebaxê de, balafirên leşkerî yên ordiya Tirkîyê, erîşeke giran birin ser Kurdistanê Başûr û gundên di mintiqaya Hayatê de bambeyaran kirin. Ev erîşa di rojên 16 û 17-ê Tebaxê de jî berdeham kir.

Rêjîma faşîst a Tirkîyê, ev erîşa hov di çarçava peymanê di navbera Tirkîyê û Iraqê de -ku di sala 1982-a de hatibû îmze kirin, dike. Bêgoman, peymanên usa li dijî peymanên navnetewî ne ku mafê gelan garantî dikin, binê kîjanan Tirkîyê û Iraqê jî îmze kirine. Lê hukumatên van welatan her tim peymanên navnetewî dane bin ligan.

Hukumata Tirkîyê di danezana xwede diyar kir, ku kuştina 12 leşkerên tirk di 12-ê tebaxê de, bîye sedemê erîşê. Lê di eslê xwe de, plana erîşê di 25-ê Tîrmehê de hatiye çêkirin. Ev yeka jî alî dewsgirê serokê Partiya Gel a Sosyal Demokrat, Tewfîq Çavdar de hate servedanê. Divê bête

zanin wekî sosyal demokratên tirk, ne li dijî erîşê ne, ew li hukumatê rexne digrin ji ber ku jî erîşê nehatine agahdar kirin. Ev yeka jî tewra hukumata tirk û partiyên muxalafetê li ser pîrsa kurdî xweş nişan dide. Ew bi her bihayî dixwazin tevgera neteweyê kurd bişkênin û bi vî awayî jî li Rohilata Navîn ji bo politîka kevneperest ku ew temsîl dikin, guhertinekî pêk-bînin. Li alîkî jî ew dixwazin hêzên şovên û nijadperest li dor xwe bicivînin û hêzên demokrasiyê li Tirkîyê bipelixînin.

Em bi şabûneke mezin dixwazin diyar bikin wekî serokê Lîbya, Muammer Qaddafi bi xurtî li dijî vê erîşa hov dengê xwe bilind kir. Mixabin ku hukumateke din dengê xwe dernexist. Divê em bidin zanîn wekî hukumata Swêd, ku her tim li dijî zordestiyê derdikeve û mafên mirovatîyê diparêze, bê deng ma. Em hê jî hêvî dikin ku hukumata Swêd wê hê deng nemîne.

Em bi xurtî terora hukumata Tirkîyê û Iraqê protesto dikin û bala hemû hêzên demokrat û pêşverû dikşînin, ku li dijî terora faşîst berpîrsyariya xwe bi cî bînin.

— BIMRE FAŞİZM!

— BIMRE KOLONİYALİZM!

— BIJÎ TEVGERA GELÊ KURDISTANÊ A AZADİYÊ!

Tirkiyê û Iraqê destpêkir. Dora 500 kesî di meşê de beşdar bûn. Li pêş sefaretên Tirkiyê û Iraqê, resolution-teksta protestoyê- binê kîjanê 16 rêxistinên kurd, tirk, ereb û ecem îmze kiribûn, hate xwendin. Sefaretên dewletên faşist teksta protestoyê wernegirtin. Derî li ser xwe dada bûn û bi dizîka di navbera perdê re li meşê temaşê dikirin.

Ji navça bajêr heta pêşiya sefaretên Tirkiyê û Iraqê beşdarên meşê bi hev re dengê xwe bilind dikirin:

— BIMRE FAŞİZM, -BIJÎ BIJÎ KURDISTAN, -BIJÎ PÊŞMERGE, -LEŞKERÊ TIRKIYÊ Û IRAQÊ JI KURDISTANÊ KÊMBE, -QATIL EVREN, -QATIL SADDAM.

Merkeza Xeberan, TT, xebere meşê li hemû rojnameyên swêdî û radyoyê belavkir. Eynê rojê radyoya swêdî û roja din jî rojnamên swêdî cîh dabûn xebere meşê. Rojnamên Dagens Nyheter û Svenska Dagbladet -rojnamên herî mezin li Swêdnivîsandibûn wekî ev meşa mezintirîn meşe ku kurdan li swêdê pêkanîne. Rojanama Dagens Nyheter herweha cîh dabû axaftina heval Hanefî Celeplî, wekî ew li bédengbûna hukumeta Swêd rexne digre û diyar dîke ku heta niha tenê serokê Lîbya Muammer Qadaffî li dijî Tirkiyê dengê xwe bilind kiriye. □

Nama wezîrê karûbarê derva yê Swêd

Piştî êrîşa Tirkiyê li ser Kurdistanê Başûr, di 15-ê Tebaxê de, Federasyonê ji hukumeta Swêd re namek şand û daxwaz kir ku hukumeta Swêd

li dij vê erîşa hov derkeve.

Hukumeta Swêd ev nama jêrîn wek bersiv ji Federasyonêre şand.

Hanefî Celeplî
Serok
Federasyonê Kurdî
BOX 45205
104 30 Stokholm

Bi helkeftina nama we derbarê bombekirina gundên kurdan ji alî balafirên tirk ên leşkerî di 15-ê Tebaxê de, ez tiştên jêrîn pêşkêş dikim.

Li gor agahdariyên rojnaman, bombebaran ji bo ku heyfa kuştina 12 leşkerên tirk bête standin, ku çend rojan berî erîşê hatibûn kuştin, pêk hatiye. Angorî agahdariyên bawerdar

gelek mirovên sîvîl hatine kuştin.

Hukumata Swêd, vê erîşê li dij prensîbên mafên gelan dibîne û jê mesafê distîne.

Hukumata Swêd gelek caran hemû cureyên terorîzmê mahkum kiriye. Dîtin me eve ku tiştên wisa divê bi riya politikayê û hêzên polîsî bîne halkirin, ne bi şerkariyê.

Bi slavên dostanî
Sten Andersson
Wezarata Karûbarê Derva
Stockholm, 1986.09.10

MEŞA PROTESTOYÊ UPPSALA-STOKHOLM



Foto: Kiki Lundgren

Piştî ku xebere êrîşa cunta faşist ê tirk di 15-Tebaxê de li ser Kurdistanê Başûr hate bihîstin, Federasyonê Komelên Kurdistanê li Swêdê biryar da wekî di roja 23-ê Tebaxê de meşeke protestoyê li dijî sefaretên Tirkiyê û Iraqê amade bike.

Endamên Komela Kurdistanê li Uppsalayê jî biryar girtin wekî ji bo ku vê erîşa faşist protesto bikin, ji

Uppsalayê ta Stockholmê (100km) bimeşin û tevî meşa protestoyê a Federasyonê bibin.

Di wexteke kurt de, Komela Kurdistanê li Uppsalayê haziriya xwe tamam kir û di roja 22-ê Tebaxê seet 11.00-a de, 61 endamên komelê -8 ji wan jin- ji navça Uppsalayê berbi Stockholmê dest bi meşa protestoyê kirin.

Beşdarên meşê di surûsermê de, di bin baranê de 25 seet bi rê ve çûn û di roja 23-ê Tebaxê, seet 12.00-a de gihan Stockholmê, cîhê meşa Federasyonê.

Piştî ku meşa protestoyê ji Uppsalayê destpêkir, gelek kurdên welatparêz û nunerên rêxistinanan ber bi meşê çûn û tevî beşdarên meşê bûn.

Sibêha 23-ê Tebaxê gelek kurdên rûniştvanên Stokholmê hatin pêşiya meşê û xwûşk û birayên xwe xistin nav çemberekî heta cîhê meşa Federasyonê.

Çawa meşa Federasyonê a protestoyê li dijî sefaretên Tikiyê û Iraqê dest pê kir, endamên Komela Kurdistanê li Uppsalayê, di pêşiya meşê de cîhê xwe girtin ta pêşiya sefarata Tirkiyê. Ji wir şûnde, ew ji taqatê ketibûn û êdî nikaribûn bimeşin. Hevalên Federasyonê ew li trêne siwar kirin û şandin Uppsalayê.

Endamên Komela Kurdistanê li Uppsalayê bi vî awayî nîşan dan ku kurd bi her awayî fidakariyê amade ne ji bo xizmeta gelê xwe. □

Dijminê bêbext qet ferq xistiye nav min û te

Diljar Bêwar

Piştî 12-yê Îlona 1980-î, cunta faşîst ya Tirkîyê, bi darê zorê hukmê welêt xiste destê xwe. Di zemanekî kin de di Tirkîyê de daxwaz û armancên xwe yê kevneperest û paşvarû bi temamî bicî anîn û sazûmana xwe ya faşîst saz kir. Lê rewşa Kurdistanê ne wek rewşa Tirkîyê ye. Çimkî Kurdistan bûye mêtîngeheke Turkiyê. Kîjan hukumet li Turkiyê were ser hikim û kîjan sazûman were saz kirin, ji gelê kurd û Kurdistanê re, tu tişt nayê guhartin. Herdem van karbidestan kuştin, girtin, êşkencekirin, talankirin, şewitandin, koçkirin, bombakirin, zêdekirina hêzên leşkerî li Kurdistanê bindest û ji hevketî de domandine û didomînin.

Belê, cunta faşîst a Turkiyê dibêje, ku ew dijî çepan û çepîtiyê ye. Lê ev gotin ji bin ve derew in, ne rast in. Heye ku ev gotin di heqê tirkan de hinekî rast be. Lê di perçê Kurdistanê ya ku di bin destê Turkiyê de ye, cunta faşîst bi temamê hebûn û hêza xwe dijminatîya milletê kurd, zimanê kurdî, urf û edetên kurdî -misilman û ne misilmanên kurdan- jin û mîrên kurd, zîvar û dewlemendên kurd, zana û nezanên kurd dike û bi her awayî wan diperçiqîne.

Ez di vir de ji gelên kurd, tirk û ji gelên mirovperwer re bi kurtî, ji serpêhatiyên xwe yê di êşkencexaneyên cunta faşîst a Tirkîyê de, yek bi tenê dinivîsim.

Sala 1983-an, li Diyarbekrê ez di êşkencexanê de bûm. Li ser navê gelek hêzên kurd, gelek kes girtibûn û anîbûn wir û tu ferk nedixistin nav êşkenceyên ku li me teva dikirin. Çi kesên li ser navê KUK, DDKD, Riya Azadî, Rizgarî, Kawa, PKK, KDP û hwd ji ku girtibûn, dijmin her curê êşkenceyên giran li teva wek hev dikir.

Wek ku her kes pê dizane, êşkencexana cunta faşîst a herî mezin li Diyarbekirê vegirtiye û tê da gelê kurd ji berê ve dihêrin û di çerxên êşkencan re derbas dikin. Di êşkencexaneyên derî Diyarbekrê de jî (yên

li Tirkîyê), ew şoreşgerên ku tu tiştê li ser hevalên xwe û li ser xebatê nabêjin, wan bi êşkencexana Diyarbekrê ditirsînin û ji wan re dibêjin: "Ha, eger tu xeber nedî, emê te rêkin êşkencexana Diyarbekrê, eger tu mîrekî zexmî hînge tu xeber mede!"

Di êşkencexana Diyarbekrê de şevê derengê şevê bû, ji ber ku çavên me timî girtî bûn, me nedizanî bû ka seet çiqase, çend êşkenceker hatin nav me. Yê girtî dora 120 kesî hebûn. Yek ji êşkencekeran pirsî: "Di nav we de yê ne misilman hene?" Çend hevalên girtî gotin: "Na!" Di nav me de çar-pênc hevalên girtî yê xiristîyan hebûn. Lê ewana ne diwêriyan ku bêjin, em xiristîyan in. Êşkencekeran dîsa pirsî: "Elewî di nav we de hene?" Çar-pênc hevalên girtî bersîva wan dan, gotin, "Ez elewî me, ez elewî me!.." Piştî bersîvdana wan hevalan, ji nişke ve êşkenceker bi hev re harbûn û êrîşî wan hevalên elewî kirin. Ew kişandine nivê bereqê (xaniyê ku em bi şevê tede diman), bi daran, çoyan, copan û bi kulmik û pêhînan li wan dan. Ji xwe, bi roj em jî lêdanê perçiqandibûn. Wan hevalên elewî xistin rewşa bêrihtiyê û çêrên were pîs ji wanre digotin ku meriv ji mirovatiya xwe fedî dike, ku behsa wan çêran jî bike: "medê û jinên we, kurên orispiyan, bê dîn û îman, ji xwe we elewîyan welatê me xirab kir, eger hûn nebûyana yê dîn çî ji vî karê zanîbûn!" û gelek gotonên hwd jî.

Piştî lêdana elewîyan, êşkencekeran dîsa pirs kirin: "Yên sunnî bila destê xwe bilind bikin!" Hevalên sunnî teva destên xwe bilind kirin. "Wey kurên orospiyan, hûn çiqas pir in!" Îcar gotin, "tenê yê şafiî bila destê xwe bilind bikin." Piştî ku me teva bi şafiyan re destên xwe bilind kir in, yekî ji êşkencekeran got: "şafiîno! rewşa lêdanê bigrin", me teva destekî xwe danî ser destê din û me ew pêş ve dirêj kirin. Her destekî me pêncî job lêdan. Paşê got: "destên xwe biguhêzin". Me destên xwe guhastin

û pêncî derb li wî destê din jî dan. Ji ber ku çavên me girtî bûn me tiştê nedidît, ji destên min xwîn diherikî, destên min dişewitîn, werimîn û agir û pêtê avête kezeba min. Pey me dor hat girtiyên ku mezhebên wan heneffî bû û êşkencekerê jî wan re got: "Heneffîno! destên xwe bilindkin." Wan jî destên xwe bilind kirin. Ew hevalên heneffî heft-heşt kes bûn. Ji wan re gotin: "Rewşa lêdanê bigrin". Weke ku me li jor girtina rewşa lêdanê nivîsî bû, bi wî awayî wana jî destên xwe girt in û li destên wan dan. Lê lêdana elewîyan û heneffîyan, gelekî jî lêdana şafiyan zêdetir bû, ji ber ku hejmara havalên elewî û heneffî jî hejmara şafiyan hindiktir bû. Ji ber ku şafiî pir bûn, di lêdana şafiyan de zû westiyan. Lê di lêdana elewîyan û heneffîyan de, ji ber ew hindikbûn, êşkenceker zû newestiyan û bêtir li wan dan.

Pey lêdana li gor mezheban, li êşkencexanê bê dengiyek peyda bû; ne ji girtiyan û ne jî ji êşkencekeran kistinî derket. Ji xwe ji girtiyan re xebardan, libitandin qedexa bûn. Tenê kuxik, pişkandin û bêhn hilkişandin, ji me re serbest bûn.

Di vê bêdengiyê de min wisa dizanî ku her yek ji me girtiyan di serê xwe de, xwe bi xwe difikire û ji xwe van pirsan dipirse;

"Çima dijminê bêbext di êşkencekerinê de tu ferqê naxe navbera kurdan. Bi eynî metodê li me teva êşkence dîke. Çi xiristîyan, misilman, elewî, sunnî, şafiî, heneffî an jî çî KUK, DDKD, Kawa, Rizgarî, Riya Azadî, KDP û hwd. Dijminê rûreş ji berê de me hemûyan diperçiqîne, dikuje û dişewitîne.

Gelo çima em ji hevdu re ne wisan in? Çima em li hevdu nakin? Çima em hevdu tehemul nakin? Çima em gotinên hevdu nakin?"

Ez pîrsekê ji temamê kurdên ku ji xwe hêviya mirovayetiye dikin, dipirsim: Tiştê ku dijminê kurd jê ditirsiye? □

CUNTA FAŞÎST DI 12-Ê ÎLONÊ DE BI XURTÎ HATE PROTESTO KIRIN



Di 12-ê Îlonê de, li Stokholmê tev hêzên kurd û tirk bi hev re cûnta Faşîst li Tirkîyê protesto kirin. Ji bo protesto kirinê, rêxistinên kurd û tirk hatibûn cem hev û platformeke protestoyê pêkanîbûn. Li ser navê platformê, heftêkê berê meşa protestoyê, belavokek bi zimanên kurdî, tirkî û swêdî li Stokholmê û li bajarên Swêdê yên din hate belavkirin.

Di belavokê de êrişên cunta faşîst li Kurdistanê û li Tirkîyê hate teşhîr kirin. Roja 12-ê Îlonê jî di navça Stokholmê de, dora 500 kesî civiyan, ji bo ku ber bi sefarata Tirkîyê meşeke protestoyê pêk bînin. Di civîna meşê de axaftinek li ser navê platformê bi zimanên kurdî, tirkî û swêdî hate kirin. Piştê Parlamenterên swêdî, Hans Görän Franck (Sosyal demokrat) û Oswald Söderqvist (Partiya Komunist a Çep) li dijî cunta faşîst axaftin û piştgiriya xwe bi şerê li dijî cunta faşîst re nîşan dan.

Piştî axaftinan, beşdarên meşê di bin bandrolên sloganên li dijî cunta faşîst ber bi sefaretê Tirkîyê meşiyên.

Ji navça Stokholmê ta pêşiya sefaretê Tirkîyê, beşdarên meşê bi hev re dengê xwe bilind dikirin û digotin:
— Bimre faşîzm!, -Evren Katîl!, -



Hans Görän Frank

Ozal Katîl!, -Bijî bijî Kurdistan!, -
Leşkerî tirk, ji Kurdistanê derkeve!,
-Bijî peşmerge!.

Li pêş sefarata Tirkîyê meşvana bi hav re "Ey Reqîb" xwendin û ji bo ruhê şehîdan deqîqakê rawestan. Bi vî awayî dawîya meşa protestoyê hat.

Radyo û telewîzyona Swêdê di eynê rojê de, rojname jî roja din xebera meşê belav kirin.

Rêxistinên ku platforma protestoyê pêk anîn ev bûn: Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, Komelên piştgiriya Yektiya Çep dikin (KOMKAR-Swêd, YKDK, ISTIB, Gerçek Adk., Birlik Yolu, DIBAF), Dayanişma Derneği, KKDK, Komîta piştgiriya Reya Şoreş, Komîta piştgiriya YSK, İşçi gerçeği, hevalbendên Tekoşîn, hevalbendên Kawa.

Komela Sinet û Çand û Navenda Çanda kurdî, diyar kirin wekî Federasyona Komelên Kurdistanê wan temsîl dike, lewra jî pêwîst nedîtînin ku di platformê de cî bigrin. Di protestoyê de endamên herdu komelan jî cîhê xwe girtin. □

Hawar: Gulistana ziman û çanda kurdî

Mihemed Bekir

Hawar gulistana çanda kurdî ye. Gulistaneke gelekî geş û rengîn e. Bihna her gulekê, xweşikiya wê, rengê wê ne wek ya din e. Dema mirov dikeve nav vê gulistanê, dilê wî nagire ku tenê çend gulên bihin bike û yên din berde. Ne jî kes dikare di aliyekî wê gulistanê keve û bi lez û bez, di aliyê din ra derkeve. Na, kes nikare xwe li hember spehîti, delalî û bihna van gulên ragire.

Gelo ezê çawa bikaribim, bi kurtî, li ser vê gulistanê binivîsim? Çiroka her gulekê, bi serpilki, ji xwendevanên hêja ra bibêjim?.. Na, ev yeka han, ne hesan e. Lê çareyeke din tine ye. Bila ew gulên bihindar û delal, dilê xwe li me negirin.

Hawar kovara çanda kurdî ye. Xwedî û berpirsiyarê wê, rewşenbîr û zimanzanê bi nav û deng, mîr Celadet Alî Bedir-Xan bû. Hawar li Şamê derdiket, lê li hemî Kurdistanê dihate belavkirin û ji her aliyekî Kurdistanê jî, rewşenbîrên kurd jê ra nivîsar dişandin. Jimara pêşîn di 15 yê Gulana 1932 an da derket. Jimara dawîn, ya 57 an di 15 yê Tebaxa 1943 an da hate belavkirin. Lê umrê Hawarê yê rastîn, ne 11 sal, belku kêmtirî 6 salan bû. Di 18 yê Tebaxa 1935 an da, piştî jimara 26 an, Hawarê vehesek daye xwe(1). Dijwarî gelek bûn(2). Di 27-ê Nîsana 1941 an da, Hawarê careke din ala xwe bilind kiriye û ew stêrka vemirî, ji nû ve, li ezmanê Kurdistanê geş bûye.

Hawar bi du zimanan derdiket, bi kurdî û firensizî. Bi gelemperî her jimarek 20 rûpel bûn. Birê firensizî tenê ji 2 heta 4 rûpelan bû. Birê kurdî, di destpêkê da (jimar 1 — 23), bi du elfabeyan dihate belavkirin (bi elfabeya latînî-kurdî û bi ya erebî-farisî). Piştî jimara 23 yan, tenê elfabeya latînî-kurdî hatiye bikaranîn.

Gelek rewşenbîr û nivîskarên me yên bi nav û deng, naveroka Hawarê bi zanîn, tecrîbe û hunermendiya xwe dewlementir û tekûztir dikirin. Va ne çend ji wan:

— *Celadet Bedir-Xan, Dr. Kamiran Bedir-Xan, Rewşen Bedir-Xan, Osma Sebrî, Qedrîcan, Cegerxwîn, Mistefa E.*

Botî, Qedrf Cemîl Paşa, Dr. Nuredîn Zaza(Yusif), Lawê Fındî, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar ...

— *Goran, Tewfîq Wehbî, Evdil Xaliq Esîrî, Şakir Fetah, Hevîndê Sorî, Pîrot, Lawêkî Kurd....*

Rehmetî C. Bedir-Xan bi xwe, stûnê Hawarê, dil û mêjiyê wê bû.

Celadet û Kamiran Bedir-xan, ji navên xwe pê ve, bi çend navên din jî nivîsarên xwe belav dikirin.(3)

Navên C. Bedir-Xan yên din ev bûn: *Herekol Azîzan, Xweyîyê Hawarê, Hawar, Stranvan, Stranvanê Hawarê, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînem-Xan.*

Navên Dr. K. Bedir-Xan yên din ev bûn:

Seydayê Gerok, Mamostayê Gerok

Hawar demeke dirêj nedikete destan. Tenê çend nisxeyên wê, li cem hin camêran û li nik hin kitêbxaneyên cihanê, parastî mabûn. Di sala 1976 an da, Hemreş Reşo, birekî wê (jimarên 24 — 57 an) ji nû ve da çapkirin(4).

Ez bi xwe jî, li ser birê pêşîn (jimarên 1 — 23 yan) dixebitim. Ez hêvîdarim ku ew piştî mehekê, bigihîne destê xwendevanan. Gelek sipas ji xanima hêja û giranbiha Rewşen Bedir-Xan ra, ku destûra çapkirina vî birê Hawarê da min. Hêvî û daxwaza Xanima me ya delal, ji xortên kurd ew e ku, ew jî bidin ser şopa Hawarê û ji bo pêşvebirina ziman û çanda kurdî bixebitin.

Dîtina me, kurdên îro, li ser kêmtiştan wek hev e. Lê, dîtina hemiyana li ser Hawarê gelekî nîzikî hev e. Rûmet û qedra Hawarê di dilê her kurdekî da, gelekî bilind e. Gelo sebeb çî ye? Gelo armanca Hawarê çî bû?

"Hawar dengê zanîne ye. Zanîna xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.

"Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin. Lewma ko zman şerta heyîne a pêşîn e."

"Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê."(5)

Bi van gotinan Hawar dest pê dike. Hawar bi van gotinên giring, doz, daxwaz û armanca xwe, bi xwendevanan dide nas kirin:

Belê zanîn û mêranî bê xwenasîn kêmtir û bêkêr in. Dîroka Kurdistanê yekê han, bi xweşikî, ji me ra dide xuya kirin.

Berî 300 salî E. Xanî dîtiye ku Kurdistan ketiye sergêjiyeke ecêb. Hin Mîr û karbidestên Kurd bûne "hevalbendên" Eceman, birekî din yê Tirk. Di nav xwe da jî bûbûn sed perçe û her yekî şerê yê din dikir. Di şerê Tirk û Ecaeman da jî dîsa ew di pêşiyê da bûn. Bi vî karê kambax, wan fedakarî û mêraniya miletê xwe, ne ji bo pêkanîna Kurdistanê serbixwe, belku ji bo xurtkirina biyaniyan û qelskirina xwe û miletê kurd bi kar tanîn.

Ev e mêraniya bê xwenasîn.

Zana, şair, dîroknivîs, zimanzan û hozanên Kurdistanê hîngê ji yê miletên din ne kêmtir bûn. Ev in çend nimûne: *Îbri-l-Esîr, Îbin Xelkan, Şeref-Xanê Bidlîsî, Îdrîsê Bidlîsî, Ebû-l-Fidayê Eyûbî, Fîzûlî(6).*

Lê wan her tiştên xwe bi zimanê biyaniyan, bi erebî, farisî û tirkî dinivîsîn. Ew ziman, zimanên dîn, hikim û dewletê bûn. Zimanê kurdî her ji bîrkirî mabû.

Holê van kurdên ha, zanîna wan miletan di her warekî da dewlementir û geştir dikirin. Li hemberê, rewşa miletê kurd di van waran da, roj bi roj, qelstir û xerabtir dibû. Van kesên jîr, lê ne dûrbîn, bi vî awayî, heyîna miletê xwe, bi destên xwe, berbi wendabûnê têve didan.

Ev e zanîna bê xwenasîn.

Ehmedê Xanî, yê dûrbîn û dilşewitî, çiqas kire Hawar, çiqas bi hunermendî û hozanî, derdê Kurdistanê dane rave kirin, lê dîsa jî kesî nedibihîst, nedidît. Kurdistan ne xwe û ne jî dost û dij-mimnê xwe nas dikirin.

Hawara Hawarê jî, ji Hawara Xanî bû. Rewşa Kurdistan, di sala 1932 an da, ji rewşa wan a ku di zemanê Xanî da gelekî xerabtir bû. Şoreşên Kurdistanê yek bi yek bi hovîti hatibûn pelçiqandin. Kurdistan hati bû parvekirin. Milet şerpeze û bê hêvî bûbû. ►

Hawarê dît ku xebateke dûr û dirêj gerek e. Xebateke ku bingehê wê zanîn û xwenasîn be. Kurdan bêtirî hezar salî, dîrok, huner, ziman û edebiyata xwe bê xwedî hiştine. Serê wan bi çanda ereb, tirk û eceman hatiye dagirtin. Bi vî awayî şexsiyeta kurdî hatiye guhartin.

Celadet Bedir-Xan, bi çavê bijîşkekî jîr, mirovê kurd ji me re holê dide naskirin:(7)

"Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye. Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e. Armanca te li ber te sekiniye. Di şiklê mirovekî de ye. Tu lê dinîhêrî, ecêbmayî dimînî. Herê tu dibînî, dest, ling, mûl, pol, parsû, parhan, her tiştên wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş, yê çepê berepaş diçit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne jî paş. Ji ber ku ji alîkî ve pêş ve, ji aliyê din paş ve tête kişandin. Tu zanî çira xorto? Lewma ku her du ling ne yek in. Navbera wan de yekî-tî nîne. Divêt, tu bixebitî van her du lîngan bi alîkî ve bilivînî."

Hawar, gelek nexweşiyên vî mirovê kurd, rave xortan dike. Hêviya miletê me ya geş, xortê kurd e. Lewra Hawar dixwaze derdên miletê me bi wan bide naskirin da ku ew bikaribin xwe ji wan derdên dijwar û cankuj vegirin. Hin ji wan derdan ev in:(7)

"Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji der ve dijmin dirêjî me kiriye. Ji her mêlê erîş. Di hundirê kelê de şerekî din, bê eman û ji yê pêşîn mezintir û diwartir heye. Şerê me bi hevûdû re. Di mal de jî dijmin."

"Herê xorto! Birîna me a mezin û xedar dexts e (hesûdî), berberî ye, jana dextsê ye. Em sîngar in. Ji der ve serma li me dixê. Li hundir em bi janê dîkîvin...."

"Xorto! Hin dixwazî bixebitin, lê tukes naxwaze li ber destê yekî din bixebite. Dil û çavê herkesî di serdestiyê de ye. Herkes dixwaze bibe axa, çavê tu kesî di peyatiyê de nîne. Ji lewra di nav me de axa nîn in herkes axa ye."

Hêviya Hawarê ji xortên kurd ev e: *"Xorto! Holê bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ku çê dikin, ava dikin...."*

"Hilweşandina stûnekî hêsani ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye."

"Di dinyayê de tutîşt nîne ku tekûz bê. Di her tiştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirîcar, kêmani hene. Heke te kêmanî dîtin, hema drêjî wan meke. Lê

bixebite ku tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan bide-dilînî."

Armanca Hawarê ew bûye, ku vê şexsiyeta nexweş û şaş hilweşîne, şexsiyeteke rast û bikêr pêk bîne. Bingehên ayneke nuh" ayîna kurdaniyê" ava bike. Gelo xebata Hawarê ji bo pêkanîna vê armanca giring çî bû û bi çî awayî bû?

Hawarê di destpêkê de pronivîseke (program, birnamic) gelek fereh û hêja daniye. Em dikarin wê pronivîsê bi van çend niqteyan rave bikin:

- 1- Sehîti ser zman û zarên kurdî.
- 2- Edebiyat û folklorê kurdî.
- 3- dîrok û erdnigariya Kurdistanê.
- 4- Jîna kurda ya civakî.

Xebata Hawarê ya giringtir di warê ziman û edebiyata kurdî da bûye. Ezê jî, hinekî bêtir, li ser wê xebatê binivîsim.

1- Ziman û milet

Dîtina Hawarê li ser zimên ev bû : "zman şerta heyîne a pêşîn e".

Belê tiştê ku heyîna kurdan heta îro parastiyê, ne mîranî û zanîna wan, belku zimanê wan bûye.

Gelo çima wezîfeya zimên di jîna miletan da evqas bingehîn û giring e? Bersiv ev e:

"Herwekî nas e, fikr û his di dora zmanî de digehêvin hev, û her zman fikr û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin, û pey zmanên xwe dikevin. Bi vî awayî digel zmanî fikr û hisên biyaniyan jî tîndikevin nav me, di dil û hisê me de cih digirin, û rû û gonê me ên manewî diguhêrin, diheşîfîn."(8)

Lê ne tenê ji bo heyîna miletê kurd, belku ji bo yekîtiya wî jî, rola zimên bê hempa ye.

"Yekbûna Kurdan jî bi yekîtiya zmanê kurdî çê dibe. Yekîtiya zmanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike."(9)

Di warê yekîtiya elfabeyên kurdî da hin xebat hati bû kirin. Lê sed mixabin ku wê xebatê jî, ji ber hin sebebên tu havil nedaye. Xebata pêşîn, li Şamê berî derketina Hawarê dest pê kiriye. C. Bedir-Xan û Zimanzanê bi nav û deng, Tewfîq Wehbî, hîngê xwestine elfabeyên xwe yên ku li ser bingehên elfabeya latînî, durist kiri bûn, bikine yek. Lê berî qedandina vî karê hêja, T. W. vegeriye îraqê. C. B. çend mehan li benda wî dimîne, çend

nameyan jê ra dişîne. Lê tu bersiv nedihatî. Hîngê C. Bedir-Xan neçar dibe ku Hawarê, bi elfabeya xwe, belav bike.

Piştî ku çend jimarên Hawarê derdikevin, ronakbîrên Kurdîstana îraqê yên ku hîni elfabeya T. Wehbî ya latînî bûbûn, dibînin ku elfabeya Hawarê û ya T. W. ne wekhev in. Ev yeka ha dilê wan dişwîtîne. Yek ji wan camêran, bi navê "Pîrot" dibîne ku hebûna du elfabeyên têvel, yekîtiya zaravayên kurdî hê diwartir dike. Ew gazinan ji Hawarê û ji T. Wehbî jî dike û daxwaza yekîtiya elfabeyên kurdî ji wan dike:(10)

"Le paşî erk û xerîkbûnî çend sale yekêk le zimanzînasê qîmetdarekanî kurd -Tewfîq Wehbî beg- le ser bîney latînî, tîpî bo zimanî kurdî helbijard, elfabêtêkî le ser ew tîpe dana û gelê lawanî kurdî îraq fêrî ew tîpe bûn û êsta be kelî êhênin. Ke çî le serêkî tîrewê karbidestanî xoşewîstî govarî Hawar çeşnetîpêkî tîryan helbijardiwe, ke legel hinekey Tewfîq Wehbî beg rêk nakewêt. Aya mumkin niye bo ewey rê be ser lêtêk-çûn nêdrêt, komelêkî şareza lem dû tîpe wurd bibinewe, ya yekêkyan helbijêrin û ya yekêkyan bixen û bew terme tîpêkî yekreng bo zimanî kurdî dabînin?"

Bersiva Hawarê ev bûye:(11)

"îro di meydanê de tiştêkî çêkirî heye. Kovarek û elfabeyek. Elfabeyek û kovarek. Nîk dilê min ji bona îro ya çêtir û rastir ev e ko em hêla xwe bidin û vê elfabeyê heta hîngê ku mihceta edîlandinê bikevit pêşîyê û rê li me bigirit, pêş ve bibin. Digel vê hindê divêt ko ez careke din jî bêjim ko em her gav meyildarî yekîtiyê ne û armanca xebata me yekîtiyê ye."

Heyf e ku zmanzanên kurdan ew kêsa zêrîn, ji destê xwe berdane. Hîngê di destpêka salên 1930 da, pejirandina elfabeyê latînî-kurdî, ji bo kurden Kurdîstana îraqê jî, gelekî hesantir bû. Nîrên wê wextê jî, ji yên îro gelekî baştir bûn. Lê kurdan ne tenê ew kêsa, belku gelek kêsen holê, ji destê xwe berdane.

Hawarê ji bo yekîtiya zaravayên kurdî jî xebateke hêja kiriye. Rewşenbîrê kurd, Hevîndê Sorî, di pênc jimarên Hawarên da(12), ev pîrsa giring, bi awayekî gelek hêja tehlîl kiriye. Li dawiyê(13), ew van pîrsên jêrîn ji xortên kurd dike:

''1- Zmanê kurdî çawan xwerû û pak dibit?

2- Bi çî awayî zarên Kurdistanê ên cihê dikevin nîzingî hev û zarekî welê têtê pê ko kurd hemî di zarên hev digehin (zarên hev fehîm dikin).

3- Zmanê kurdî çawan pêş ve diçit û bi çî awayî biser dikevit? ''

Dîtînen ronakbîrên kurd ên wek: Osman Sebrî, cegerxwîn, Elî Seydo Gewrî (Goranî), Lacê Henî (Mihemed Elî Ewnî), Pîrot û yên hin camerên din, li ser vê pîrsa giring di çend jimarên Hawarê da hatine belavkirin.

Bi rastî Hawar gulistana zimanê kurdî ye. Ji bo sehîtiya ser zar û devokên kurdî, Hawar gencîneyeke bê hempa ye. Rûpelên Hawarê, bi zarên kurdî yên tével, Kurmanciya bakur, ya başûr û Zaza (dumilî), bi devokên kurdî yên rengareng, hatine xemilandin. Lê heyf e ku, heta îro jî, ev gencîneya ha kêma hatiye bi kar anîn.

Belê, Hawarê dîtiye ku, çeka miletê kurd ya tevî xurt, zimanê wî ye: ''Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. Ol yek. Zman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bi tenê ye û bend tenê zman e.'' (14)

Lê ev çeka han jî ne çekeke temam, lê nîvçek e. Zimanê kurdî, wek zimanên miletên din, pêş ve neçûye. Ew bê xwedî û bê avdan maye. Ji ber vê yekê jî, Hawarê bi hemî hêza xwe, ji bo pêşvebirina zimanê kurdî xebitiye.

Bi dîtîna Hawarê, hîmê zimanan ji sê hêmanan pêk têt:

a- *Elfabê.*

b- *Rêzman (gramêr).*

c- *Ferheng.*

a- Elfabê

Hawar kovara pêşîn bû ku ji bo nivîsandina zimanê kurdî, hîmê elfabeyeke latînfî-kurdî danî. Dema rewşbîrên kurd dest bi weşandina rojname û kovaran, kirine hingê dîtine ku elfabeya erebî-farisî bi kêrî nivîsîna zimanê kurdî nayê. Ev yeka han di kovara ''Jîn''ê da baş xuya dike (15). Di zimanên samî da, hin dengdar û hin dengdêrên ku di kurdî da hene, nîn in. Dengdêrên kurt, bi gelemperî, nayine nivîsîn. Vê yekê, nivîsîna zimanê kurdî bi elfabeya erebî-farisî xistiye belayeke mezin.

Heta berî pêncih salî jî ev komên gotinên kurdî, bi elfabeya erebî-farisî

wekhev dihatine nivîsîn:

<i>ker</i>	<i>kir</i>	<i>kur</i>
<i>şêr</i>		<i>şîr</i>
<i>şor</i>		<i>şûr</i>

Em dikarin nimûneyeke din jî bînin, malîkekê ji Mem û Zîna E. Xanî. Mamoste M.Emîn Bozarşan ew malîka bi vî awayê jêrîn, ji tîpên erebî wergerandiye tîpên latînfî:

''Xanî ji kemalê bê kemalî
Meydanê kemalê dîtî xalî''

Hemî ''ê'' û ''î'' di vê malîkê da, bi tîpa erebî '' '' hatine nivîsîn.

Tevî ku zmanzanên kurdan, di van çend dehsalên dawîn da ser û binê gelek tîpên erebî bi îşaretên rengareng xemilandine, disa jî xwendin û nivîsîn bi elfabeya erebî-farisî dijwar e. Denganiya (fonêtîk) erebî û kurdî di gelek dangan da dûrî hev in. Ji vê yekê pê ve jî, piraniya tîpên elfabeya erebî

li gor cihên wan di bêjeyê de (di destpêk, nav an paşîya gotinê) bi awayên tével têne nivîsîn. Gelek çaran mirov dikare gotinekê bi çend awayên tével binivîse. Ev sebeb hemî, nivîsîn û xwendinê bi bi elfabeya erebî-farisî, gelekî dijwar dikin (16). Hînbûna vê elfabê, bi hemî endazeyên wê va, ne karekî hesan e.

Hawarê bi xebitandina elfabeya latînfî-kurdî, xwendin û nivîsîna zimanê kurdî gelek hesan û zelal kir. Sed carî mala Celadet Bedir-Xan ava be. Mîr Celadet, di panzdeh jimarên Hawarê da, li ser elfabeya xwe dinivîse. Ew hemî pîrsên giring di van nivîsaran da, bi ferehî rave xwendevanan dike:

— C. Bedir-Xan tîpên elfabê yek bi yek bi xwendevanan dide naskirin. Bi ferehî li ser dengên hember wan tîpan disekine û xweserîtiya her dengêkî dide zanîn. C. Bedir-Xan wan û yên hin zimanên din jî dide berhev û her carê sebeba hîlbijartina tîpekê ji xwendevanan ra zelal dike. Di vê helbijartinê da, C. B. elfabeyeke fonêtîkî pêk aniye. Yanê hember her dengêkî tîpeke tenha û hember her tîpekê dengê daniye. Vê yekê xwendin û nivîsîn bi elfabeya Hawarê gelekî hesan kiriye. C. Bedir-Xan di helbijartina tîpan da, qasî ku mimkîn bûye, xwe nizîkî elfabeya tirkî kiriye. Daxwaza wî ew bûye, ku kurdên Kurdistanê bakur, bi hesanî, hînfî elfabeya Hawarê bibin.

— Dengên kurdî yên bingehîn, li gor dîtîna C. Bedir-Xan 31 in. Ew vê dîtîna xwe holê ji me re dide zanîn:

''Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî hatine çêkirin xuya kirine ko di zmanê kurdî de dengên bingehîn ev sîh û yek in. Ew jî bi van sîh û yek herfan hatine nîşan kirin.'' (17)

C. Bedir-Xan dengên ''h'' û ''x'', dengine biyanî hesab kirine (18). Lê ew di Hawarê da, hatine bi kar anîn.

Li ser, jimara fonêmên kurdî, heta îro jî micadeleyeke tûj heye (19). Gelo (ç, k, l, p, r, t) rengên (ç, k, l, p, r, t) ne, an jî ew fonêmine serbixwe ne? Gelo divê dengên (x' û h') têkevîne elfabeya kurdî, an na?

Ev pîrseke bingehîn û dirêj e. Em nikarin di vê pêşgotinê da bi ferehî li ser bisekinin.

Rehmetî C. Bedir-Xan du guhartin xistine elfabeya Hawarê:

1- Di jimara 24 an da tîpên ''q'' û ''k'' bi hev guhartin. Ji jimara 1-23 an ''kurd û Kurdistan'' holê dihate nivîsîn: ''qurd û Qurdistan''.

2- Ji jimara 27 an û heta dawiyê, ''ê'' û ''î'', dema di pê wan ra ''y'' tê,

kurt hatine nivîsîn:

Dê dêya mîn — birazî birazîyê mîn
(jimar 1-26)

Dê diya mîn — birazî birazîyê mîn
(jimar 27-57)

dêya mîn

Bi vî awayî elfabeya Hawarê ji 31 tîpan pêk hatiye û kemiliye

b- Rêzman

Piştî belavkirina elfabê, Hawarê dît ku êdî, divê rêzmana zimanê kurdî jî bête belavkirin. Zimanê kurdî bê xwedî bû û gelek çaran ew bi awakî şaş dihate bi kar anîn. Rastnivîsîn û rastxwendin bê rêzmana zmên naçe serî. Di jimara 27 an da, Hawarê, dest bi wê karê giring jî kiriye. Di bîst û du jimarên da, ''Bingehên gramêra kurdmançî'' hatine danîn. Lê heyf e, ku umrê Hawarê yê kurt, rê nedaye, ku ev gramêra ha temam bibe. Benda dawîn di jimara 54 an da hatiye belavkirin. C. Bedir-Xan bi wezîfeya gramêrê, deng û elfabê, dest pê dike. Bi dirêjî li ser van hêmanên gramêrê dinivîse:

Navdêr û tewanga wan, pronav, rendgêr û jmarnav.

Heta îro jî, ev nivîsarên C. Bedir-Xan li ser gramêra kurdî, bê hempa ne. Zanîna wî gelekî kûr û fereh bûye. C. Bedir-Xan di tehlîla xwe da, ne tenê li ser devokêkî, belku li ser piraniya devokên kurmançî sekiniye. ►

c- Ferheng

Hêviya Celadet ew bû, ku ferhengê jî ji zimanê kurdî ra saz bike. Ew hêviya şerîn bi cih nehat. Lê Hawarê xebateke hêja di vî warî da kiriye. Hawarê giringiya ferheng ji bo pêşveçûna zimên xweş nas kiri bû. Wek bijîşkekî jîr, Hawarê, çelsî û nexweşiyên zimanê kurdî di warê ferhngî da nas kiri bûn.

"îrû di zmanê me de du texlît kêmanî hene: Wendabûna pirsinen kurdî û ketina pirsinen biyanî nav zmên."(20)

Hawarê ew pirsên ku ji hin zaran ketine, ji zarên kurdî yên têvel, ji stran, mamik, medhelok û çirokên kurdî kom kirine û ew di ferhengoka Hawarê da, hin bi hin belav kirine. Li cihê pirsên biyanî, Hawarê, herçend jê hatiye ewçend, pirsine nuh çêkirine û xebitandine. Pirsê "çand" yek ji wan pirsan e.

Belê, ji bo danîna ferhengeke kurdî, ferhengoka Hawarê, bingehêkî gelek hêja û bikêr e.

Edebiyat û folklor:

Edebiyata miletekî, jiyana wî bi tesnîf kiriye. Ji her rengekî, qasî mimkin bûye, ewqas nimûne berhev kirine û di Hawarê da belav kirine. Rûpelên Hawarê bi medhelokên têvel, bi çîrok, çîrcîrok û stranên rengareng hatine xemilandin. Hawarê gelek ji wan wergerandine firenzisî jî û xistine nav birê kovarê yê firenzisî. Hawar stranên kurdî bi vî awayê jêrîn tesnîf dike:(21) Li gor demdariya stranan:

1- Stranên ku demeke dirêj dijîn û li gelek aliyên Kurdistanê tene strandin.

2- Stranên ku demeke kurt, pirçaran, tenê salekê dijîn.

Li gor cûreyên stranan:

1- Lawik: Stranên lirîk û evîne

2- Şer :Stranên li ser şer û cengê (Delal)

Hinek ferq di navbera stranên şer yê kurdên çiyayî û deştî da heye. Naveroka Delal nayê guhartin. Xortek diçe şer, evîndara wî li mal dimîne. Ew agirê dilê xwe, hêviya vegera evîndarê xwe, mêraniya wî û eşîra wî di şer da, bi "Delal" distire.

3- Dîlok: stranên govend û dîlanê

4- Lavij, lavijok, laje: Stranên dîni.

5- Bêrîte, bêlîte: Stranên şagirtên dibistanên dîni.

Naveroka van stranan ji şî'rên E. Xanî, Melayê Cizerî, Melayê Bate...

temamî ye. Hêvî, serpehatî, fikir, his, bawerî, diltengî, kêfxweşî, xebat, adet, rabûn û rûniştina wî, her tiştên ku ew pê mijûl dibe, ji edebiyata wî miletî tene naskirin. Edebiyat jî, devkî û nivîskî ye. Edebiyata kurdî ya devkî ewqas bilind, dewlemend û rengîn e, ku hempaya wê di nav edebiyatên cihanê da gelekî kêr in.

Lê Kurdan dewlemendiya vê gençneyê nas nekiri bûn. Dema kurdnasên ewripayî hatine Kurdistanê, li hember vê edebiyata kurdî ya devkî ecêbmayî mane. Wan hê tiştêkî welê spehî û rengîn nedîti bû. Hema dest bi komkirina folklorê kurdî kirine û ew wergerandine zimanên ewripayî: Rûsî, elamanî, firenzisî, inglîzî û îtalî. Bi xebata wan camêrên biyanî, birekî hêja ji folklorê miletê me, hate parastin. Destana Memê Alan, yek ji wan e.

Hawar di ferhengoka xwe da (hejmar 30), folklorê holê bi me dide zanîn:

"tevayîya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê derketine û di dora nişan de bi ser ve ketine û gihastine nişên nû (zanîn — zanistiya xelkê ye)"

Xebata Hawarê di vî warî da gelek giring bû. Yek ji xebatên Hawarê yê tevî hêja bû. Hawarê folklorê kurdî hatine hîlbijartin

6- Beste: Stranên tevî giran.

Belê, dema mirov bixwaze miletê kurd baş nas bike, hîngê baştîrîn rêber û ferehtîrîn ferheng, ev edebiyata devkî ye.

Dem a mirov edebiyata kurdî ya nivîskî dide ber ya devkî, dibîne ku ferqeke pir mezin di nav wan da heye. Ew ne kêmtirî ferqa ku di navbera mirovekî gihîştî û zorokekî da ye. Meqsed ne ew e ku ev edebiyata nivîskî pûç û bêkêr e, belku bê xwedî û bê avdan maye. Ji roja ku ola îslamî cihê xwe di Kurdistanê xurt kiriye û heta zemanê Hawarê, tenê çend camêrên kurd bi zimanê xwe nivîsîne. Jimara hemî rûpelên ku heta zemanê Hawarê hati bûn nivîsîn, ji çend hezaran ne bêtir bû. Ew jî -bi gelemperî- tenê şî'r bûn. Lê tevî vê yekê jî, eserên hin şai'rên kurd, ji eserên cihanî yê tevî hêja tene jimartin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, yek ji wan e. Ji xwe, yek ji sebebên ku Xanî Mem û Zîn, bi kurdî nivîsîye, ev bûye: Bikêrhatina zimanê kurdî di warê edebiyat û zanîne da, bi miletê xwe û bi cihanê,

bide naskirin.

Xebata Hawarê, di warê geşkirin û pêşvebirina hêmanên edebiyata kurdî ya nivîskî da, xebateke gelek hêja û bi zanînin bûye:

"Bi bîst hejmarên kovara me ko heta niho belav bûne, me dil dikir, em her awayê nivîsandîne biceribînin û bêxin zmanê xwe. Herwekî awayên bingehî, nezm û nesir û çend şiklên nesrê kêr û zêde di Hawarê de belav bûne. Tenê awayê temaşayê hebû ko hêj nekerti bû zmanê me. Mîna ko xwendevanên me di vê hejmarê de dê bixwînin, me ew şikl û awa jî ceriband û xiste zmanê xwe. Temaşake kiçik bi navê (Hevind)." (22)

Klasîkên kurdî ji bîrkirî mabûn. Ji çend mele û rewşenbîran pê va, kêr kesan ew û şî'rên wan nas dikirin. Hawarê ew ji nû ve vejandine. Memozîna E. Xanî û dîwana melayê Cizerî, bi elfabeya Hawarê hatine belavkirin. Hawarê li ser klasîkên din jî, wek Elî Herîrî, Feqehê Teyran û gelekên din, bi kurtî, nivîsîye.(23)

Hawarê gelek nivîsarên hêja ji zimanên din jî wergerandine kurdî: Hin perçe ji siyahetnava Olya Çelebî, ji kitêba Ksenofonê Yunanî(24), ji nivîsarên gerok û kurdnasên biyanî ên din(25), tefsîra Quranê û hedîsên pêxember, çarînen Xeyam û gelek tiştên din.

Hawarê gelek nivîsarên giranbiha li ser van mijarên jêrîn belav kirine:

a- tarîx û erdnigarî Kurdistanê:

Kardox û welatê Kardoxan, (Hawar 23, r.4-7), Hrekol Azîzan

Kurd û Kurdistan bi çavê biyanîyan, (Hawar 19, 23, 24), Herekol Azîzan

Kurdên Ecmistanê û halê wan, (Hawar 35, r.10-12), Herekol Azîzan
Tarîxa Kurdistanê, (Hawar 28, 29, 30), Osman Sebrî

Navên Kurdmanc û cihên Kurdistanê, (Hawar 28, r.12), Hişyar

Kurdîstana Bakur — bajarên wê, (Hawar 37, r.7), Hişyar

b- jîna kurdan ya civakî:

Jin û bextiyariya malê, (Hawar 28, r.12), Rewşen Bedir-Xan

Stûna xwendevanan, (Hawar 31, r.10-11)

Jêliyan ji eşîrên Botan, (Hawar 32, r. 8-13), Herekol Azzan



FESTÎVALA KURDÎ LI STOKHOLMÊ

8-ê Tebaxê li Vasaparken, deng dabû nava bajarê Stokholmê, bi sedan metir ji dûr ve dengê muzîka kurdî dihate bîhistin. Gelek swêdiyan, xwe li dengê ku dihate guhê wan girtibûn û hatibûn cîhê ku dengê muzîka kurdî jê belav dibû. Li wir bi sedan malbatên kurd tevî zar û zêçên xwe civiyabûn û guh didane stranên kurdî û dîlanên kurdî temaşe dikirin. Herçend tirsarîna baranê hebû jî, malbatên kurdan ji taxên Stokholmê, ji bajarên Swêd, wekî Göteborg, Katrineholm, Eskilstuna, Söderhamn û Uppsalayê hatibûn festîvala kurdî.

Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ev festîval hazir kiribû; ji bo ku malbatên kurdan bicivin, hev-

du nasbikin û hesreta di dilê xwe de derxînin. Herweha armanc ew bû ku swêdî kurdan û çanda kurdî nas bikin.

Ji bo amedekirina festîvalê Federasyonê xebatek baş kiribû. Tev rêxistinên demokratîk û pêşverû hatibûn vexwandinê festîvalê.

Di Festîvalê de programeke dewlemend hate pêşkêşkirin. Ciwan Haco tevî hevalên xwe yên elman, Leo û Teo ji Elmanya hatin û muzîka kurdî bi alatên modern pêşkêşî mêvanan kirin. Keça kurd Delal, ji Fransa hatibû û bi tembûra xwe, bi dengê xweyê xweş stranên kurdî stran. Herweha dengbêjên kurd, Brîndar, Fexredîn û Rênas, ku li Swêd dijîn, mûzîk û stra-

nên kurdî pêşkêş kirin. Koma Şengal, koma folklor a Komela Jinên Demokratên Kurdistanê û koma folklor a Komela Kurdistanê Li Spån-ga bi dîlanên kurdî reng dane festîvalê.

Di destpêka Festîvalêde, heval Şoreş Bladhede xêrhatina mêvanan kir û mêvan vexwandin rwastanê ji bo bîranîna şehîdên Kurdistanê. Dûre serokê federasyonê heval Hanefî Celeplî axaftinek kir. Di axaftina xwe de heval Hanefî li ser rewşa Kurdistanê û kar û barê Federasyonê sekîni. Herweha li ser vexwandina Federasyonê, parlementerê Partiya Karkerên Sosyaldemokrat, Barbro Evermo axaftineke dûr û dirêj li ser aşitiyê, xebata li dij nijadperestiyê û li ser rewşa biyaniyan li Swêdê kir û di dawiya axaftina xwe de silavên Partiya Karkerên Sosyaldemokrat pêşkêşî Federasyonê kir û serketina Federasyonê xwest.

Di festîvalê de destkirên kurdî û tabloyên hunermendê kurd Hîfzullah Çakirbey hatin pêşandan û bala mêvanan kişandin. Herweha pêşandeya ku wênekêşa swêdî Ann Eriksen hazir kiriye, hate pêşandan. Endamên Komela Kurd Li Stokholmê jî xwarina kurdî çêkiribûn û di festîvalêde pêşkêşî mêvanan kirin. Hemû weşanxanên kurdî jî pirtûkên xwe di festîvalêde firotin.

Di dawiya festîvalê de, li ber dengê dehol û zirnê mêvanan destê hev girtin û bi hev re ketin dîlanê. Dev devî êvarî festîvala kurdî dawî hat û mêvan jî bi dilşadî belav bûn.

Li rûpela alî rastê em cîh didin axaftina serokê Federasyonê, Hanefî Celeplî.





Gelî xwîşk û birayên xoşewîst,
Zarokên delal,

Hûn ser seran ser çavan hatine fes-
tîvala kurdî. Em hêvî dikin ku hûnê
demeke xweş derbas bikin.

Xwîşk û birano,

Îro em li vir, bi hezaran kîlometir
ji Kurdistanê dûr civiyane ku hesre-
ta di dilê xwe de derxînin. Herweha
bi vê civînê em dixwazin çanda xwe
bidin naskirin.

Belê, li dervayî welatê xwe em azad
in, wekî em çanda xwe pêşde bibin û
bidin naskirin. Lê li welatê xwe, li
Kurdistanê, dijmin ne tenê azadiya
me ji destê me girtiyeû herweha dij-
minê hov çanda me; dîlan û stran,
ziman û edebyata me; bi kurtî hebû-
na me qedexe kirine û dewlemendiya
welatê me yên binerdê û sererdê talan
dikin. Ji bo ku vê talanê bidomînin
jî, êrîşên hov li ser gelê me roj bi roj
zêde dikin.

Li Kurdistana Başûr, rêjîma Baasî
faşîst, herroj gund û bajarên Kurdis-
tanê bombebaran dike û dişewîtine.
Bi koman mirovên bêmudafa didin
ber gullan û êdam dikin. Gundiyên
Kurdistanê ji cîh û warê wan dûr
dixin. Lawên gelê kurd ji bo arman-
cên xwe yên qirêj dişînin şer.

Rewşa Kurdistana Rohilat jî ûsa
ye. Xomêyniyê devbixwîn, hê ji xwî-
na gelê me têr nebûye, bi navê misil-
mantiyê êrîşên hov dibe ser Kurdis-
tanê; kal û pîr, jin zar nabêje, miro-
vên bêmudafa hemûyan dide ber
gullan. Gund û bajarên Kurdistanê
bombebaran dike û dişewîtine.

Li Kurdistana Bakûr jî rêjîma Tir-
kiyê ya faşîst xwîna gelê me dirêjîne.
Bi deh hezaran kurdên pêşverû û
welatparêz îro di zîndanên de, di bin
êşkêncên giran de dijîn. Ji 12-ê Îlona
1980-î û bi virde, bi sedan lawên kurd
yên mîrxas di bin êşkêncan de hatin
kuştin. Li herderê Kurdistanê leşke-
rê Tirkîyê kombûne. Şerekî neêlan-
kirî li dijî gelê Kurdistanê didome.
Herweha hukumata Tirkîyê ya faşîst,
erdê Kurdistanê pêşkêşî emperyalîz-

ma Emerîkî kiriye; leşkergehên Eme-
rîka li ser erdê Kurdistanê herçû zêde
dibin û aşîtiya cîhanê têhdîd dikin.

Li Kurdistana Başûra Roava rewş
cûdatire. Herçend êrîşên leşkerî dija-
war tunebe jî, gelê me ne xwediyê
mafên xweyî netewî û demokratîk e.
Bi sedhezaran kurd di welatê xwe de
"biyanî" tên hesab kirin.

Ji ber zor û setema dijminê hov, bi
hezaran kurd ji Kurdistanê dûrketi-
ne û hatine Swêdê û welatên din.
Mixabin, faşîstên har li dervayî Kur-
distanê jî didin pey me û law û keçên
me dikujin. Ev yeka jî diyar dike, ku
dijminê hov li herderê şerê me dike.
Ew, li dijî gelê kurd tu ferqî nadin
berçavan. Lewra, divê em jî li hem-
ber dijminên gelê xwe, li herderê,
bibin yek, dest bidin destê hev û bi
hevre dengê xwe bilind bikin.

Li alîkî pêvîste em bi vî awayî, li
dervê Kurdistanê têkoşîna xwe bido-
mînin û piştgiriya gelê xweyê mîrxas
bikin. Ji bo vê yekê potansiyeleke me
mezin heye. Tenê li pêşiya me maye,
wekî em vî potansiyelê derbasî here-
ketê bikin.

Li alî din jî, vaye em dibînin, li van
welatên ku em lê dijîn, çawa îmkanên
me hene, ûsa jî astengên me hene.
Berî her tiştî, ev azadiya ku li Kurdis-
tanê dijmin ji destê me girtiye, li der-
vayê Kurdistanê di destê me de ye.
Em zimanê xwe yê li welêt qedexe ye,
va ye dikarin bi serbestî bi kar binin.
Çawa tê zanîn netewek bi zimanê
xwe, çanda xwe û edebyata xwe heye.
Divê em kar bikin ku ziman, çand û
edebiyata xwe pêşde bibin. Di hişyar-
bûna gelekî bindest de, rola ziman û
edebiyata wî gelî pir mezine. Herwe-
ha divê em ziman, çand û edebiyata
xwe bi cîhanê bidin naskirin û bidin
zanîn ku neteweyê kurd xwedî ziman
û edebiyata te, xwedî çandeke dewle-
mend e. Bi vî awayî emê karibin pêş-
iyê li propagandên dijmin bigrin, ku
dibêjin kurd ne miletekî serbixwe ye
û ne xwediyê zimanekî ye û pir caran
jî çanda kurdî, edebiyata kurdî wek
yên xwe hesab dikin. Heta carna jî

zimanê kurdî wek zaravekî zimanên
xwe nîşan didin.

Lazime em diyar bikin, ku di vî
warî de rêxistinên kurdî, kurdên rew-
şenbîr di van salên dawî de gavin hêja
pêşde avêtine. Divê ev gavana hîn jî
pêşdetir herin.

Di van welatên Ewropa de, her
wisn astengên me jî hene. Îro dora
nîv mîlyon kurd li Ewropayê dijîn.
Hejmara yên ku li Swêd dijîn, 8 hezar
in. Ferqa jiyana li van welatan û li
Kurdistanê gelekî mezine. Ev ferqa,
di hin pirsan de ji bo me hêsaniye û
di hin pirsan de jî dijwarî ye.

Bi hezaran zarokên me di van wela-
tandê tene dinê, dighên û mezin
dibin. Li ser pirsan zarokan lazime em
bi ciddiyetekî mezin bisekinin, dijwa-
riyên di vî warî de tepsît bikin û ted-
bîrên pêwîst bi hevre bigrin. Divê em
ji bo zarokên kurd îmkanan peyda
bikin ku ew karibin bi zimanê xweyê
zîkmakî bixwînin, kurdîtiya xwe baş
nas bikin û mezin bibin, ku li van
welatan winda nebin; gava mezin
dibin fêde bighînin gelê xwe û welatê
xwe Kurdistanê.

Çawa tê zanîn, welatên cîhanê, di
rêxistinên navnetewî de, di Yekîtiya
Netewan de li ser pirsan zarokan seki-
nîne û mafên wan tepsît kirine. Ew
welatên ku înzên xwe avêtine bin van
peymanan, berpirsariya mafên
zarokan jî dane ser milên xwe. Lê
mixabin, ew welatên kolonyalîst ku
Kurdistan di nav xwe de parve kiri-
ne, wek gelek peymanên din ên nav-
netewî, ev berpirsariya li hember
zarokên kurd jî paşguh kirine. Lew-
ra jî divê em, rêxistinên kurd, di plat-
formên navnetewî de doza mafê zaro-
kên xwe bikin û wan dewletên kolon-
yalîst rûreş bikin.

Herweha ev xebat ji bo ciwanên me
jî lazime. Divê em alikariya wan
bikin, wan di riya welatparêziyê de
bighînin û teşwîqê xwendinê bikin.

Rewşa xwîşk û daykên me, bi tay-
betî jî di van civatên nû de gelekî dij-
ware. Divê em bi xurtî alikariya xwîşk

FEDERASYONÊ SEREDANA HUKUMETA SWÊD KIR

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, ji bo ku hukumeta Swêd li ser rewşa multeciyan kurd agahdar bike û li ser kar û barê Federasyonê infor-masyon bide, ji wezîra biyaniyan, Anîta Gradîn re namek şand û hev-dîtinek jê xwest.

Di 16-ê Îlonê de Hukumeta Swêd delegasyonê ji Federasyonê qebûl kir. Li ser navê Federasyonê, serokê Federasyonê Hanefî Celeplî û endamên seksiyona Federasyonê ya multeciyan, Kerîm Abdûllah û Keya Îzol di civîna di gel hukumetê de beşdar bûn. Li ser navê hukumatê jî Jonas Widgren, Lars Björnberg û Anita

Edam beşdar bûn.

Di civînê de, delegasyona Federasyonê, li ser kar û barê Federasyonê agahdarî da nûnerên hukumatê. Bahsa awayiya Federasyonê ya nû kir û da zanîn wekî di nav Federasyonê de seksiyonek ji bo multeciyan kurd hatiye damezrandin. Programa seksiyona multeciyan ji hukumatê re hate pêşkêş kirin. Dûre li ser rewşa multeciyan kurd hate sekinîn. Wekî rewşa wan di kampên multeciyan de nebaşê, di karê tercumanîyê de, li ser karê polîs di îfade girtinê de, di parastina abûkatên multeciyan de bala hukumatê li ser kêmasiyan hate

kişandin. Herweha di tewra Daîra Biyaniyan a Dewletê (SIV) de bala hukumatê hate kişandin, wekî li gor salên borî guhartineke negatîv tê dîtin.

Nûnerên hukumatê tev daxwazên Federasyonê li cem xwe nivîsîn. Wan jî derbarê kurdan û xebata Federasyonê pirsên xwe kirin.

Di dawiya hevdîtinê de, nûnerên hukumatê diyar kirin wekî ew gelekî razî man û qiymeteke bilind didin kar û barê Federasyona Komelên Kurdistanê. Herweha wan diyar kirin ku Federasyon her tim bixêr hatiye cem hukumatê.

CIVÎNEK BI MAQAMÊN SWÊDÊ RE

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, ji bo ku programa xwe a xebatê bi maqamên Swêdê bide nas-kirin, di 15 Îlonê de li lokala Federasyonê li gel deh maqamên Swêdê civînek çêkir. Di civînê de komelên endamê Federasyonê, Komela Kurd li Stockholmê, Komela Kurdistanê li Spånga û Komela Jinên Demokratên Kurdistanê Li Swêdê jî beşdar bûn.

Civîn ji du beşan pêkhatibû. Di beşa yekemîn de, agahdarî ji alî Federasyonê û komelên wê hate dayin. Di beşa duemîn de jî, ji alî maqaman agahdarî hate dayîn.

Di beşa yekemîn de, serokê Federasyonê xêr hatina mêvanan kir û bi kurtî bahsa rewşa kurdên li Swêd kir, wekî ew ji ber çî sedeman, di kîjan deman de û ji kîjan mintiqên Kurdistanê hatine Swêdê. Herwaha karê wanê rêxistinîyê çawa destpêkiriye û îro di çî merhelê de ye. Di vir de, li ser awayiya Federasyonê ya berê û ya îro jî agahdarî hate dayin.

Di dawî axaftina xwe de, serokê Federasyonê li ser programa Federasyonê ya xebatê sekinî û diyar kir wekî Federasyonê ji bo zarok, jin, xort û multeciyan kurdan li Swêd çî kiriye û çî difikire bike.

Dûre, nûnerên komelên endam li ser rewşa komelên xwe axaftin, pro-


grama xwe pêşkêş kirin û astengên xwe ji aliyê alîkariya belediya Stockholmê de dan zanîn.

Di beşa duemîn de, nûnerên maqaman behsa kar û barê xwe kirin û prensîbên alîkariya ji bo komelên civakî dane zanîn.

Di dawiya civînê de, herdu aliyan jî hevdu pirsên xwe kirin û bi vî awayî angorî programê dawiya civînê hat. Nûnerên maqaman diyar kirin wekî ew ji civînê gelekî dilxweş bûne û qiymeteke bilind dan awayiya Federasyonê ya nû.

Maqamên ku di civînê de beşdar bûn ew bûn: Daîra Biyaniyan a Dewletê(SIV), Meclîsa Çandî a Dewletê(Statens Kulturråd), Instîtuta Materyalê Dibîstanan a Dewletê(SIL), Meclîsa Ciwanan a Dewletê(Statens Ungdomsråd), Îdara Biyaniyan ya Belediya Stockholmê (Stockholms Invandrar Förvaltningen), Îdara Wextê Vala ya Belediya Stockholmê (Stockholms Fritidsförvaltning), Îdara Çandî ya Belediya Stockholmê (Stockholms Kulturämnden), Rêxistina Xwendekaran a Merkezî li Stockholmê (SSCO), Meclîsa Komelan a Spångayê (Spånga Förening-sråd), Buroya Multeciyan li Stockholmê (Stockholms Flyktningsbyrån).

Deysen Keyo Cîgerxwîn çû heqîya xwe



Xortê delal Deysen Keyo Cîgerxwîn di 13 saliya xwe de, piştî nexwşi-yeke giran roja 30.09.1986-a li Stokholmê çû heqîya xwe.

Deysen, tevî malbata xwe ji Kurdistana Suriyê 4 sal berê hatibû Swêdê û di dibistana ewlîn de dixwend.

Roja ku cinaza Deysen li Stokholmê hate veşartin, 9.10.1986, dora 150 heval û hogirên malbata Deysen di merasîma cenazê de beşdar bûn.

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, Komela Kurd li Stockholmê û Komela Jinên Demokratên Kurdistanê li Swêdê jî di merasîmê de beşdar bûn û çeleng danîn ser gora Deysen.

Zimanê zikmakî û mafên mirovên biyanî di vî warî de

Bareş Battê

Mirovên biyanî yên ku li Swêdê xwedî mafê rûniştin û kar in, wek mirovên swêdî xwedî piraniya mafên mirovanî yên ku di qanûna Swêdê de hatine nivîsandin in. Her weha divê bête kebûl kirin, ku mirovên hemwelatîya Swêdî bidest xistine, xwediyê mafên bêhtir in. Lê dîsan divê meriv bêje, ku wekhevî di dabaşa xwendinê de heye. Heger ev maf di qanûnê de nivîsandî be, nayê wê manê ku meriv ji van mafan nayê bêpar kirin.

Gotina "bêpar kirin" yan jî "maf ji dest girtin" bi gelek ûştan ve girêdayî ye. Wek: Nezanî, ziman nezanî, tîrnekirina malhebûnê û gelek tiştên din. Ez dixwazim bi kinayî derbasî ser dabaşa "zimanê zikmakî" bibim. Bi rastî dabaşa me kurdên li Swêdê di vî derbarê de bûye pîrgirêkeke pîr mezin û bê derman. Nemaze Kurdên ku ji Bakura Kurdistanê hatine û bi zimanê tikî dizanin, bêhtir di nava vî pîrgorêke de cî digirin.

Ji bo înfomasyon û ji bo ku ez bikaribim meselê baş zelal bikim, ez ê çend benda ji "plana xwendin û hînkirinê a xwendegêha bingehîn" tercume bikim û di pey de jî tecrûbe û dîtînen xwe li ser bidime nasîn. Wek ku min li jêr tercûme kiriye, di pêşarmancên destûrê de weha dibêje:

Di pêşveçûneke çak û pak de pêvîste ku mirov zimanê xwe yê zikmakî baş zanibe.

Şagirtên ku zimanên wan ne swêdî ne, divê bikaribin zimanê xwe bi pêş de bibin û danûstandinên xwe bi welatê xwe re serast bikin.

Armanc, Bi kurtebirî ev e:

-Armanc ev e ku şagirt zimanê xwe bi pêşve bibe, da ku bahwerî bi xwe û serbixwebûna xwe binê û rewşa xwe di nava civata xwe de bi jiyana xwe ve girê bide.

— Xwendina zimanê zikmakî divê ji bo danûstandina navbera malbatê bibe rêberek. Divê rê li şagirt vekê ji bo hînbûna du zimanan.

— Eger pêşveçûna ziman bête rawestandî, pêşveçûna mirov jî pêre tê rawestandî. Ji bo vî yekê divê armancên xwendina zimanê zikmakî

û alikariya şagirt, di vî warî de bête bikaranîn.

Swêdiyan dîr û dirêj di destûra xwendegêhên xwe de li ser zimanê zikmakî û giranbihayîya wî nivîsîne. Lê min bi kinayî ew li jor da xwiya kirin. Êdî ku em werin ser rewşa me kurdên Kurdîstana Bakur, rewşa weha ye:

— Zarokên me dest bi xwendina kurmancî dikin.

— Zarokên me bi kurmancî destpêdikin, lê dixwazin bi tirkî jî bixwênin.

— Kurmancî berdidin divên bite-nê tirkî bixwênin.

— Ji binî tiştêkî naxwînin. Ji kurdîtiya xwe fedî dikin û xwe vedîşêrin.

— Li dor sala 8 û 9-an a xwendinê, ne kumancî, ne tirkî û ne jî swêdî baş hînkirin. Dibin xwediyên sê niv-zimanan.

— Di dema xwe ya xortaniya xwe de û li vî welatê pêşkati, ji xwendin û pêşveçûnê bêpar dimênin.

— Di pey vî de jî, dibin xulam û kolê dinya modern, bi qayilbûna hinek karên wek paqijiyê û firax şuştinê û hinek tiştên din.

Em dikarin lîsta xwe pîr dirêj bikin û tu carî jî neqedênin. Lê dermanê me ne ev e. Gelo derman çî ye? Li gor dîtina min ev e:

— Divê em bikin ku zarokên me bi zimanê xwe bixwênin. Em xwe û zarokên xwe ji asimilasyonê rizgar bikin û danûstandinê xwe bi welatê xwe re bidomînin.

— Saetên wan yên dersê hindik bin jî, divê em jê fêdê bikin. Li malê xwe bi zarokên xwe re bi zimanê xwe xeber bidin.

— Emê bo çî ji xwe û ji zimanê xwe fedî bikin. Em ji gelek mîletên dinê yên din bêtir zimanê xwe dizanin û xwediyê çandêke pîr dewlemend in.

— Divê em wextê xwe bidin zarokên xwe û xwendina pirtûk û kovarên bi zimanê xwe ji xwe re bikin kar. Cî hindiktir bidne zimanê wan welatên kolonyalist.

— Divê em dest pêbikin kursên kurdî bixwînin û komelên xwe mec-

burî pêkanîna karê xwendin û nivîsandinê bikin.

Di dawî de dixwazim bi kinayî wiha bêjim:

Em kurd jî wek gelên din, xwedî welat, çand, ziman û xwedî karaktereke serbixwe ne. Zimanê xwe xwendin û bi zarokên xwe ve bi zimanê xwe xebirdan, rûmet e, serbilindayî ye, mêranî ye û pêşveçûn e. Azadiya Kurdistanê, xwe nasîn e, xwe nasîn bi ziman tê pîvan û rîya azadiyê pêşveçûna ziman e, hevgerîtin û mezinbûna çanda me ye, têkoşîna me ya bi ziman û ji bo ziman e. Ji bo vî yekê jî pêvîst e em zimanê xwe yê zikmakî bixwênin û bikin ku zarokên me jî bixwînin. Kurdîtiya jî vir destpê dîke û gerek ev be. . .


Bi hêviya serketin û pêşveçûna zimanê kurdî û bi banga zaneyên kurd diqedênim:

"Kurdno! Bi zimanê xwe bixwênin. Bila serê we bilind be. Zarokno! Hînkirinê zimanê xwe bibin. Serbilindîya we bi zimanê we ye." □

Azmûna tercumanên kampê

Di mehên dawîn yên biharê de Daîra Karûbarên Biyanîyan ya Dewletê biryar da, ku ji bo tercumanîya di kampan de azmûnekê (îmtîhan) li dar bixe. Ev azmûne berî her tiştî nasîna rewşa zimanzanîna tercumanan bû. Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanan bû, ku jêre azmûneke holê pêwîs dihate dîtin. Azmûn li sê bajarên Swêdê, li Norköpingê, Landskrona û Märstayê hatin li dar xistin. Herwek hejmara bilind ya serlêderan jî dida xuya kirin, tercumanîya kurdî di rewacê de bû. Daîra Karûbarên Biyanîyan ya Dewletê êdî ji bo karpêdana di kampan de, kesên ku di vî azmûnê de bi ser ketine, tercîh dîke.

Me Yilmaz Güney bi bîr anî



Di 9-ê Îlonê de, du sal derbas bûn li ser mirina lawê kurd ê hêja Yilmaz Güney. Bi helkeftina sersaliya mirina Yilmaz Güney, Federasyonê di wê rojê de civîneke bîranînê li taxa Stockholmê, Tensta amade kir. Di civînê de li dora 200 kurdên welatparêz civiyabûn ji bo ku Yilmaz Güney bi bîr bînin. Di dawiya civînê de filma Yilmaz Güney, "Kerî" hate nîşan dan. Berî ku fîlm bê nîşan dan, serokê Federasyonê Hanefî Celeplî axaftinek kir. Di axaftina xwe de heval Hanefî bi kurtî wisa got:

"Îro ne cara yekem e, ku em mirovekî kurd piştî mirina wî bi bîr tînin. Gelek caran em hatine cem hev, wekî mirovên ku bûne hebûna gelê me yê bîndest, bi bîr bînin. Çend mehan berê em jî bo bîranîna şairê nemir Hêmin civiyan, par ji bo mamosteyê mezin Qanatê Kurdo û şairê mezin

Cîgerxwîn civiyan. Ev yeka jî nîşan dide ku neteweyê kurd li hebûna xwe xwedî derdikeve. Ji xwe ev hebûn in ku netewekî li piya dihêle û jîndar dike. Dijminê me çiqas xurt be jî, gava em li hebûnên xwe xwedî derkevin, ew nikarin bighên armancên xwe yên qirêj.

Bi xebatên Yilmaz Güney, ne tenê gelê kurd serbilinde, herweha tev hêzên pêşverû serbilindin. Xebatên Yilmaz Güney bala cîhanê kişandiye û taqdir dîtiye.

Yilmaz Güney di dilê gelê me de diji û wê her bijî!"

Piştî axaftina heval Hanefî, xwîşka Xezal Aras, seroka Komelên Jinên Demokratên Kurdistanê li Swêdê axaftineke dirêj li ser jiyana û xebata Yilmaz Güney kir. Em li vir cîh didin axaftina xwîşka Xezal Aras.

Yilmaz Güney, di sala 1937-a de li Edenê, li gundê Yenîcê hate dinê. Malbata wî kurd bû. Wek piraniya kurdên din yên ku di bajarên metro-pol de dijîn, malbata wî jî, ji ber tunebûn û xizaniyê, ji Kurdistanê hatibû Edenê. Piçûktiya Yilmaz Güney, di nav tengasî û belengaziyê de derbas bû. Wî li alîkî dixwend û li alîkî jî karên cure-cure, wek pemboçînîn, emelefî û hw. dikir.

Cara ewil, di sala 1952-an de, çîro-keke wî li ser şerê gundiyan, di kovara "Birgün" de hate weşandin. Bi vê sedemê ew rastî sosyalîstan hat, bi wan ra peywendî danî û hişyarbûna wî di meselên siyasî de destpêkir. Lê ew şexsiyeta xwe ya netewî, bi çavekî siyasî û zanistî nedinasî. Wê demê tiştên ku bala wî dikşand, pirsên çînî û civakî bûn. Yilmaz Güney bi van dîtînan dest bi nivîsaran kir. Di wan salên xwe de ew hertim di bin çavdariya polîsan de bû. Ji ber nivîseke wî, damga "propaganda komunîzmê" pêva danîn û derheqa wî de mehke-me vekirin.

Yilmaz Güney, di sala 1955-an de li Edenê xwendina navîn qedand û li Istenbolê di Zanîngeha Aboriyê de dest bi xwendina bilind kir. Li wir di gel xwendinê bi sînemayê mijûl bû, di fîlman de leyist, asîstaniya fîlman kir û senaryo nivîsîn. Vê navberê de mehke-mên wî domkirin. Sala 1961-ê de hat girtin û 18 meh di girtîgehê de ma. Li wir romana xwe ya "Ew stuxwar mirin" nivîsî. Piştî ku ji girtîgehê derket, bi awakê aktîv di nav kar û barên sînemayê de cîh girt. Hetanî sala 1972-an di bêtirî 100 fîlman de leyist.

Ew fîlmên ku heta sala 1970-î Yilmaz Güney di nav de bi aktîvî cîh girtiye û leyistiye, bi armanceke fîcarî hatine çekirin. Di wan fîlman de bûyer bi nihêrmeke civakî û sosyalistî nehatine danîn. Babeta naveroka wan fîlman, bi piranî li dijî zordaran e û têkoşîna şexsekî ye. Rizgarbûna tevayî ya civakî nehatiye nitirandin.

Lê, çawa ku baş tê zanîn, di dewletên kapîtalîst û kolonyalîst de wek dezgayên din, sînema jî di bin destê karbidestan de ye. Ew, vê dezgayê



Zezal Aras

hertim ji bo propagandayên xwe yên paşverû bikartînin. Ew di vê warî de zû bi zû firsend nadin destê kesên pêşverû. Di qada sînemê de, ji bo ku mirov bikaribe serbest bixebite, divê mirov pir bi tecrube û xurt be. Yilmaz di wan salên xwe de vê rastiye îtîraf dike. Ew dibêje "Ji bo ku di vê sîfira guran de li ser piya bimînin, ez tavîz didim. Ez van tavîzana ji bo roja hunermendekî bê tavîz bim, berhev-dikim."

Yilmaz Güney hêdî hêdî gotinên xwe bi cîh tîne. Cara ewilî di sala 1970-î de filma "Umut" (Hêvî) çêdike. Ev film ne tenê di jiyana Yilmaz Güney de, her wisan di dîroka sînema Tirkiyê de jî dibe destpêka merheleyeke nû. Ji wir şûn de êdî pirsên civakî, pirsên karkeran, gundiyan, derd û kulên wan dibin babetên naveroka filmên wî.

Çawa tê zanîn di sala 1971-ê de rejîma faşîst hate ser hukim û êrişeke bêhempa anî ser hêzên welatparêz û şoreşger. Ji vê êrişê Yilmaz Güney jî para xwe girt, ew avêtin girtigehê. Wî di girtigeha leşkerî ya Selîmiyê de sê pirtûkên din nivîsîn.

Dawiya sala 1974-an bi afûya giştî Yilmaz Güney ji girtigehê derket. Cardin bi aktîvî dest bi karên sînemayê kir. Sê meh û nîv piştî azadbûna xwe ew li ser kuştina hakimekî faşîst hat suçdarkirin û girtin. Dadgeha burjuvaziyê 18 sal ceza birî jêra. Lê belê, ji hunermendê mezin re girtigeh tesîr nedikir. Edî tekoşîn perçek ji jiyana wî bû. Dîsa bi ezm û xîreteke bê westan karê xwe li hundir jî domand. Senaryo ya "Kerî", "Dij-min" û "Rê" berhemên wî yên girtigehê ne. Ev hersê film jî li Tirkiyê hatin qedexa kirin. □

Yilmaz Güney di filmên "Kerî" û "Rê" de kamera xwe zivirande ser Kurdistanê. Pêyvendî û bîrûbaweriyên feodalî raxist ber çavan. Zilm û kedxwariya kolonyalîstan ya li ser gelê kurd nişanî milyonan da. Li ser rewşa jinan bi taybetî sekinî. Yilmaz Güney di gotubêjekî xwe de di derheqê jinên kurd de dîtînen xwe bi awakî vekirî diyar dikir. Wî digot "Jinên Kurdistanê di bin zordestiyeke dubare de dijîn, ev li hêlekê zordestiyeke feodalî ye, li hêla din jî girêdayî bêparmayîna ji azadiya aboriye. Rizgariya jinên kurd bi ya netewa wê û bi taybetî jî bi ya çîna wê va girêdayî ye.

Yilmaz Güney di girtigehê de du pirtûkên din, bi navê "Ji kurê min re çîrok" û "Em sobe, şûşeya pacê û du nan dixwazîn" nivîsî. Herweha çend nivîsar jî li ser meselên siyasî nivîsî. Ji ber van nivîsaran cezayên nu xwar û li ser hev cezayên wî gihîşt 100 salî.

Piştî darbeya faşîst ya 12 îlonê, êdî îmkana xebatên wî nema. Tenê riyek li ber wî mabû; firarkirin. Di dawiya sala 1981-an de derket deryayî welêt û li Fransayê cîwar bû.

Wek tê zanîn, di sala 1982-an de di Festîvala Navnetewî ya Cannesê de filma Yilmaz Güney "Rê" xelata zêrîn girt. Bi vê xelatê, nav û dengê Yilmaz Güney û filma wî li çaraliyê cîhanê belav bû. Bi mehan ev film li welatên Ewropayê hat nişandan. Bala milyonan kişand li ser Kurdistanê, li ser rewşa girtiyan, jinan, zarokan û zilm û zordestiyên li ser gelê kurd.

Yilmaz Güney li Fransayê pirsê kurd û Kurdistanê ve bêtir mijûl bû. Dîtînen wî li ser pirsê netewî di çarçoveke zanistî û realist de rûnişt. Wî di nav hîmdarên Enstîtuya Kurd de cihê xwe girt.

Yilmaz Güney beriya mirina xwe di şeva newrozê de, dîtînen xwe yên li ser rizgariya gelê kurd bi tehrêkî zelal û vekirî diyar kir. Wî digot:

"Gelî hevalan, cefta, stem, belengazî, xwîn û hêsirên çavan qedera gelê kurd nîne. Em vê qederê red dikin, em vê qederê nas nakin. Em naxwazîn ku em bibin zarokên welatekî ji çaralî de îsgalkirî û mistemleke. Em dixwazîn bibin zarokên welatekî kurdî serbixwe, yekbûyî û azad; zarokên Kurdistanê. Em dixwazîn li welatê xwe, li ser axa xwe bi zîmanê xwe stranên evîn û azadiyê bistirên."

pêşandanek

Serhat

Hunermendê kurd, Omar T. Karîm, di meha Îlonê de hatibû Stokholmê û tabloyên xwe li taxa Rinkebyê pêşan dabû. Pêşandana ku di navbera 13-16 ê Îlonê de domkir, bala gelek swêdiya kişand. Di van rojan de bi sedan kes hatin û li tabloyên hunermendê kurd O. T. Karîm temaşe kirin.

Dora 40 tabloyan di salona Folketshus de hatibû pêşan dan. Têma tabloyan li ser xo û mirovên Kurdistanê bûn. Li ser navê "Berbangê" me seredanek li pêşandanê kir û ji kak O. T. Karîm pirsî.

— Min ev pêşandana xwe bi helkevtina 11 saliya Partiya Sosyalîst a Kurd û 25 saliya şoreşa Îlonê amade kir.



O. T. Karîm di sala 59-an de li bajarê Kurdistanê, Suleymaniyêde bûye û cara yekem li vir di sala 1976-a de tabloyên xwe pêşan daye. Rêjîma Baas li Îraqê du caran O. T. Karîm xistiye zindanê ji ber ku wî bi tabloyên xwe rexne li rejîma Baas girtiye. Lewra hunermendê kurd O. T. Karîm ji Kurdistanê der çûye û îro li Berlînê dijî.

Piştî Stokholmê ewê li Danimarkê û Hollandayê jî tabloyên xwe pêşan bide.

— Ez dixwazim bi hunermendiya xwe xizmeta çanda netewayê kurd bikim û li derveyî welêt kurdan bidim naskirin, dibêje O. T. Karîm. □

ELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM JI KOM

Şeveke kurdî li Söderhamnê

Şeva 13-ê Îlonê, dengê def û zirnê, stran û dîlanên kurdî bala bi sedan rûnişvanên Söderhamnê kişandibû. Cara yekem bû ku li Söderhamnê şeveke kurdî hatibû amade kirin.

Şeva kurdî ji alî Komela Kurd li Söderhamnê û ABF (Rêxistina Perwerdekirina Karkeran) hate çêkirin. Di şevê de dora 300 kesî civiyabûn. Programa Şevê jî dewlemend bû. Ji Stockholmê Federasyonê, gruba folklor a Komela Jinên Demokratên Kurdistanê û dengbêjê kurd Faxredîn şandibû. Ji Hudiksvalê û ji Bollnäsê grubên muzîk a kurdî hatibûn. Xwûşka Zozan û Xwûşka Kulîlk jî ji Stockholmê çûn û stranên kurdî pêşkêş kirin. Komela Kurd li Söderhamnê jî xwarineke kurdî hazir kirin û mêvanên şevê vexwendin xwarinê.

Heval Şoreş Bladhede, li ser navê Federasyonê di şevê de beşdar bû û agahdariyeke fireh li ser rewşa Kurdistanê û kar û barê Federasyonê da

mêvanan.

Roja din rojnama wê navçê, "Helsing Kuriren" çêheke fireh dabû şeva kurdî.



Pêşandanek li ser jiyana li Kurdistanê

Li bakûrê Swêd, li bajarê Söderhamnê Komela Kurd li ser jiyana li Kurdistanê pêşandanek amade

kir. Pêşandanê ji roja 12-ê Tîrmehê destpêkir û 18 rojan dom kir. Di van rojan de gelek swêdî hatin

û li pêşandanê temaşa kirin.

Pêşandanê, herweha bala dibîstanên swêdî jî kişandibû. Şagirtên 12 sinifan tevî mamostayên xwe serdana pêşandanê kirin û her sinifekî 45 deqîqe li ser jiyana Kurdistanê ders kirin.

Di pêşandanê de, wêneyên ku wênekêşê swêdî Ann Eriksson li Kurdistanê kişandibûn, wêneyên îşkence û êdamên ku rêjîmên Tirkîyê, Îranê û Îraqê dikin, hebûn. Destkirên kurdî jî di pêşandanê de çêheke fireh girtibûn.

Rojnameyê wê mintiqê di hejmarê xwe ya di roja 14.4.1986-a de, ciheke fireh dabû pêşandanê. Rojnamevanê swêdî, Thorbjörn Nordwall ûsa nivîsandibû.

— Wêneyên çandin, xwendin, dîlan, nan lêxistin, lîstik û cejnê bi wêneyên ku êşkence û êdamên ku hukumeta Îraqê dike, tev li hev bûn.

— Wargehên şer, ku ji birîndarên şer pêkhatine, wek siyekî reş xwe dabû ser pêşandanê ku şabûna gel, hêvî, tirs û têkoşîna jiyana rojîn li Kurdistanê nîşan dida.



JI KOMELÊN ENDAM JI KOMELÊN ENDAM

Şeva piştgiriya Kurdistanê Li Stokholmê

Komela Kurd Li Stokholmê di 20-ê Îlona 1986-an de şeveke piştgiriya Kurdistanê li dar xist.

Di şevê de gelek malbatên kurd ji her çar perçên Kurdistanê tevî zarokên xwe civiyabûn. Herweha gelek mêvanên swêdî jî, ku yek ji wana brerpirsyara daîra biyanî a belediya Stokholmê, Îrîş Ohlsson bû, hatibûn. Dora 350 kesî di şevê debeşdar bûbûn.

Komîta amedekirina şevê xebateke baş kiribû û programeke dewlemend pêşkêşî mêvanan kirin. Şevê bi axaftina serokê Komela Kurd Li Stokholmê, Nebî Bal destpêkir. Pey axaftina serok, mesajên rêxistinên kurd ku ji şevê re şandibûn, hatin xwendin.

Dûre, dengbêjên kurd Rênas, Fexredîn, Brîndar, Kulîlk, û Nasir Rezazî

bi stranên gelerî û komên folklorê, Koma Şengal û Koma Govend bi dîlanên gelerî şev geş kirin.

Di programa şevê de herweha du pandomîm jî hebûn û gelekî bala

mêvanan kişandin. Bi taybetî jî kêfa zarokan bi van lîstikan hat.

Di dawiya şevê detev mêvanan destê hev girtin û ketin dîlanê di gel stranên Nasir Rezazî. □



Li Sundsvalê Komela Kurd saz bû

Di 22-yê Gulana 1986-an de, kurdên ku li bajarê Sundsvalê dijîn, civînek çêkirin û bîrbara sazkirina komeleke kurd dan. Di civînê de komîtek hate hîlbijartin ji bo ku kongra damezrandina komelê bicivîne. Heta ku kongre bicive, komîtê gelek karûbarên berbiçav kirin.

Di 27-ê Îlona 1986-an de kongra damezrandina Komela Kurd Li Sundsvalê bi 33 endaman ve pêk hat. Endamekî Komîta Çavdêr ya Federasyonê di kongrê de beşdar bû. Piştî ku organên komelê hatin hîlbijartin û bîrbar hatin girtin, herweha kongrê bi yek dengê bîrbar da ku Komela Kurd Li Sundsvalê bibe endamê Federasyonê.

Em Komela Kurd Li Sundsvalê ji dil û can pîro dikin û di xebata wan de serfiraziyê dixwazin. □

FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊDÊ PÊNC SEMÎNER LI SER ZIMANÊ KURDÎ AMADE DIKE

M. Emîn Bozarlan, di semîneran da li ser hin peyvikên kurdî dipeyive û awayê nivîsîna wan di pirtûkên klasîkî da û di weşanên kurdî yên nûhayîn da dide ber hev, ji hozanên kurdên berîn ên wek Melayê Cizîrî, Xanî, Melayê Bateyî, Feqiyê Teyran û wd. numûnena nîşan dide.

Demên semîneran:

01.11.1986, roja şemiyê - demjimêr: 13.00 - 16.00
08.11.1986, roja şemiyê - demjimêr: 13.00 - 16.00
15.11.1986, roja şemiyê - demjimêr: 13.00 - 16.00
22.11.1986, roja şemiyê - demjimêr: 13.00 - 16.00
29.11.1986, roja şemiyê - demjimêr: 13.00 - 16.00

Cî:

Kursverksamheten (KV), Engelbrektsgatan 9,
oda 404, Stockholm.
(T-Bana Östermalmstorg, li teniştê Humlegårdenê)

Bi xêr werin!

BERBANGA ZAROKAN

Bawerî bi dendika xoxê bîne, Bi qeweta xwe ewle be

Nivîskar: Yilmaz Güney

Werger: Temo Zêrîn

Wêne: Haslet Soyuz

Lawikê biçûk, ji bo ku dendika xoxê bi diranên xwe bişkêne, zor dida xwe.

Bavo jê re got:

"Kurê min! . . Tu nikarî dendika xoxê bi diranên xwe bişkênî!"


Lêwîk, dîsan bi diranên xwe zor da dendika xoxê. Qalîkê dendika xoxê ya hişk û kertîkî ku dirûvê lastîkên trektorê pê diket, rûkê diranê wî mehand û qirçmî jê anî. . . Lêwîk destê xwe ber bi diranê êşiyayî bir. Diranê wî dileqiya.

Bavo careke din deng lê kir û got: "Kurê min, dendika xoxê hişk e, heyfa diranên te ne".

Lêwîk serhişkî dikir. Wî dê her ev dendika hişk bişkênanda. Danî erdê û bi pehniya sola xwe pê lê kir. Dendik ne dişkiya.

Lêwîk got: "Heger tu rikoyî bî, ez ji te hê rikoyîtir im."

Vê carê bi destê xwe rahişte kevi-



rekî, xwest ku wê bi kêvir bişkêne. Di her lêdanê de, dendik bi alîkî ve dipengizî.

Bavo gotê: "Kurê min dendika xoxê pir hişk e. Bi wî kevirê biçûk tu nikarî bişkênî!"

Lêwîk bi hêrs dendik da ber lingan. Dendik pengizî, çû kete nav axa nik pompa avê. Lêwîk bi hêrs pê lê kir û ew qenc binaxî kir.

Çend rojek di navberê re derbas bûn. Lêwîk dendika xoxê ji bîra kiribû. Ji xwe re bi zarokên taxa gecekonduyê(1) re difist. Bavo gazî kir û got:

"Ev çi ye kurê min?"

Lawik li aliyê ku bavê wî bi tiliya xwe dinimand, nihêrî. Gîhayekî biçûk, şîn î dupelî li ber çavên wê ketin û got:

"Gîha ye."

Bavo got: "Ne gîha ye."

"Ev terha dara xoxê ye. Ji wê dendika xoxê ya ku te ne dikarîbû bi diran û kevir bişkênanda, derhatiye."


Lêwîk ew dendika hişk û rikoyî bi bîr anî. Dendika ku ne bi diranê xwe û ne jî bi kevir û pêhna karîbû bişkênanda, welê guhêrî bû, bibû terhek. Vê terha han dê bejn bida û bibûya darek, wê gulçîçek vedana. . . xox bidana. Heyîrî. . .

Bavo jê re got:

"Kurê min. . . çi çax û di bin çi nîrî de dibî bibe, gava ku serê te kete tengasiyê, dendika xoxê bi bîr bîne. Te ew dendika ne bi diranê xwe û ne jî bi kevir dikarîbû bişkênanda. Lê dendika ku dikeve nav axeke nangîr, roj tê ew qalîka hişk parçe dike, erdê vediqelêşe û şîn tê.

Lawê min ê rindik, de ka çi ye, ya vê qewetê dide dendikê?

Dendik, qeweta parçekirina qalîka xwe ji nakoyîyên navxweyî distîne, kurê min. Her tişt di nava xwe de jêkdûriyên xwe disitirîne. Her tişt di



nava xwe de xwedî kakilê xweguharandinê ye".

Lawik guh bi baldarî dida ser bavê xwe û ew guhdarî dikir.

Bavo bi ken gotê:

"Bawerî bi dendika xoxê bîne.

Bi qeweta xwe ewle be! . . ." □



(1) "Gecekondu" peyveke tirkî ye û mana "di şevêkê de hatiye danîn" dide. Li Tirkiyê ji xaniyên ku bêtir li perên başarên mezin yê endustriyê, ji text û tenekên bi kêrhatî û li ser erdê bê tapo çêkirî re tên gotin. Piraniya herî mezin ya kesên ku di van xaniyan de rûdinin, ji gundiyan koçkirî û herweha kesên likarger yê ji bajarên têvel yê Kurdistanê û Tirkiyê ne, pêk têt. Taxên ji van xaniyan pêkhatî, ji bilî ku xemla bajêr in, xwedî pirsgirêkên civakî, aborî, siyasî û hwd in. Ew, bê guman, dongî encamên siyaseta çepel ya pêşveçûn û geşekirina aborî ya bê mûwazene ya kapîtalîzmê ne.

FESTÎVALA KURDÎ

Dûmahîka rûpel 13

û daykên xwe bikin, ku ew ji tenêbûnê, ji nezaniyê rizgar bibin û di nava refên şerê demokratîk û netewîde cihê xwe bigrin. Bê ku ew tevî şerê netewî û demokratîk bibin, serketina me ne mumkun e. Ji ber ku nîvê netewekî jin in.

Çawa tê zanîn, di van salên dawî de gelek multeciyên kurd mecbûr man ku ji Kurdistanê dûr bikevin. Gelek ji wan hatin welatên Ewropa. Çend hezar jî hatin Swêdê. Rewşa ku xwişk û birayên me yê multecî tede ne, qet ne başe. Pirê caran ew demeke dûr û dirêj li benda musada rûniştinê dimînin, jiyana xwe di kampên de derbas dikin. Ji xwe rewşa kampên çiqas nebaş e, gelekên ji me jî dîtine. Divê em destê alîkariyê dirêjî wan bikin û di çarçova prênîsîbên Yekîtiya Netawan de, li hember hukumata Swêdê doza mafên wan bikin.

Îro têkoşîna neteweyê kurd a azadiyê bi her awakî hewcedariya piştgirî û alîkariyê ye. Divê em vê têkoşînê bi hêzên demokratîk û pêşverû bidin naskirin û piştgiriya wan bigrin. Herweha divê em êrişên dijminê hov li ber çavê cîhanê rêxînin û wan riswa bikin.

Xwişk û birano,

Em bawer nakin ku sedemek hebe ku em nikaribin vê xebatê bi hev re bikin. Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê ev kar daye pêşiya xwe û niha em bi sazkirina vî karî mijûl in. Ji bo ku em bi serkevin, lazime tev kurdên welatparêz, demokrat û pêşverû di vî xebatê de hazir bin. Divê bête zanîn, ku ev xebat bi 10 endamên Komîta Kargêr ya Federasyonê nameşe. Lazime komelên ku endamên Federasyonê ne, xwe xurt bikin û hinek ji vî barê giran bidine ser milên xwe. Ji bo wê jî lazime her kurdê welatparêz di belediya xwe de bibe endamê komelên Federasyonê û tevî xebata pêwîst bibe. Tu sebebek tune ye ku em nikaribin di warî demokratîk de, di çarçova prênîsîbên diyar de bi hev re karibin û yekîtiyekî saz bikin.

Tiştê ku gelê me ji me dixwaze, berî her tiştê yekîtiyê.

-BIJÎ YEKÎTIYA HÊZÊN KURD !

HAWAR...

Dûmahîka rûpel 11

Çiyayên Silvan, (Hawar 39, r.8-9), Mihemed Cemil paşa

Agirî, (Hawar 36, r. 8-9), Osman Sebrî

c- Nûçeyên rewşenbîrî:

Zarî Kurdmancî, (Hawar 7, r.6)

Reya Teze, (Hawar 8, r.2)

Şihir û edebiyata kurdî, Refîq Hilmi (Hawar 32, r.15)

Hawarê roj bi roj cihê xwe di dilê miletê kurd da ferehtir dikir. Hîmê zimanê kurdî xurtir dikir. Gelek kes hînê elfabeya Hawarê bûbûn, pê dinivîsîn. Zimanê kurdî yê nivîskî, roj bi roj geştir dibû, baweriya milet bi zimanê xwe û bikêrhatina wî kurtir dibû. Gelek rewşenbîr û xortên kurd, ji her hêleke welêt, nivîsarên giranbaha ji Hawarê ra dişandin. Hawarê bingehê xwenasîn û zanîne her ferehtir û xurtir dikir. Tevgerê rewşenbîrî û welatparêzî li ser hîmekî xurt û bikêr, geş û bilind dibû.

Ez hez dikim vê bendê, bi çend gotinên Hawarê yê giring biqedînim: *"Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tene daqurtandin. Ko gihane hev dibin lehî, lehîke boş. Tu kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata welatê me di rabûna vê lehiyê de ye"*(26)

Not:

(1) Hawar, hejmar 27, rûpel 4, Sê tarîxên Hawarê, Xwediyê Hawarê.

(2) Hawar, çapa Elmaniya, pêşgotina Dr. N. Zaza.

(3) Kovara Korî Zanyarî Kurdî (Bexdad), cild 5, rûpel. 282, Sadiq Behaidîn

(4) Belîna Rojava -çapxana Durshlag-

, Îlona 1976 an.

(5) Hawar, h. 1, Armanc, awayê xebat û nivîsandina Hawarê.

(6) Ensiklopêdiya İslam (Kurd, Kurdistan), r. 481

(7) Hawar, h. 17, r. 1-6 (bi tîpên erebî), Xwe binas, Celadet A. Bedir-Xan.

(8) Hawar, h. 1, r. 5, Edebiyata welatî, Dr. Kamiran A. Bedir-Xan.

(9) Hawar, h. 3, r. 4, (bi tîpên erebî), Bi hinceta pîroznamekê, C. Bedir..

(10) Hawar, h. 10, r. 1-2 (bi tîpên erebî), Eksî seday Hawar, Pîrot.

(11) Hawar, h. 10, r. 5-6 (bi tîpên erebî), Li ser yekîtiya.., Xweyiyê Hawarê

(12) Hawar, h. 11-15, Yekyêfîman, Hevîndê Sorî

(13) Hawar, h. 16, r. 1-2, (bi tîpên latîni), Ey lawanî kurd, Hevîndê Sorî.

(14) Hawar, h. 20, r. 1-3, Heyîneke yeksalî, C. A. Bedir-Xan.

(15) Jîn, Cild 1, r. 6, çapa Swêd 1985, Wergêr: M. E. Bozarslan.

(16) Zimanî Yekgirtûy kurdî, r. 83, Dr. Cemal Nebez

(17) Hawar, h. 2, r. 5-6, Elfabeya kurdî, C. A. Bedir-Xan.

(18) Hawar, h. 1, r. 2, Elfabeya kurdî, C. A. Bedir-Xan.

(19) Hêvî, h. 1, r. 8-18, Parîs 1983

(20) Hawar, h. 1, r. 2, Armanc, awayê xebat û nivîsandina Hawarê

(21) Hawar, h. 3,4 birê firensizî, (Le folklore Kurde)

(22) Hawar, h. 20, r. 2, Heyîneke yeksalî, C. A. Bedir-Xan.

(23) Hawar, h. 33, r. 6-14, Klasîkên me, Herekol Azîzan.

(24) Hawar, h. 32, r. 4-7, Kardûx û welatê kardûxan, Herekol Azîzan.

(25) Hawar, h. 17, r. 1-2, Bawerî bêganeyek, Hevîndê Sorî

Hawar, h. 19, 23, 24, Kurd û Kurdistan bi çavê biyaniyan, C. Bedir-Xan

(26) Hawar, h. 2, r. 2, Lehî

AGAHDARÎ

Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê ji bo alîkariya multeciyên kurd li Swêdê seksiyonek damezrandibû. Ew seksiyon bi pirs û pirsgerêkên multeciyên kurd li Swêdê mijûl dibe.

Niha endamekî seksiyonê ji heftê du rojan; Duşemî û Sêşemî di navbera seet 14.00 — 17.00 de di lokala Federasyonê de hazire ji bo ku alîkariya multeciyên kurd bike.

Hemû multeciyên kurd bi xêr bîn

Navnîşana Federasyonê ya Seredanê:

Hornsg. 80, qaf 1.
Stokholm

Nivîsandinê:

BOX 45205

104 30 Stockholm

Telefon: 08/68 60 60

Lokala Federasyonê herroj navbera seet 10.00 0

18.00 vekiriye.

فیدراسیون کوپوننومیهکی بو کاره دستانی سوید پیک هیئا

دیداری نوینهرانی فیدراسیون و کاره دستانی حکومتی سوید

فیدراسیونی کومه له کانی کوردستانی له سوید به مهستی ئاگادار کردنی حکومتی سوید له سهر کاروباره کانی خوئی و پراکیشانی سهرنجی کاره ده - ستانی حکومت سهارهت به وه زعی په نابهرانی کورد لهم ولاته پرۆزی ۱۶ ئووت چاوی به نوینهرانی حکومت کهوت .

لهو چاوی پیکهوتنه دا له لایهن حکومتی سوید یوناس ویدگرین یارمهتیده ری وهزارهتی بازاری کار و لارش بیورن - بهری و له لایهن فیدراسیون پراهنی جیهله پلی سهرۆکی فیدراسیون و کهریم عهبدولا و کهیا ئیزول ئەندامانی بهشی په نابهرانی فیدراسیون به شدار بوون .

لهو چاوی پیکهوتنه دا نوینهرانی فیدراسیون باسی ریکخراوی تازهی فیدراسیون و دامه زانی بهشیکی تاییهتی له فیدراسیون ن دا بو پیراگهشتنی وه زعی په نابهری کوردی یان هیئاگورپی و ههر وهها لهو که مایهسی یانه دوان که له یارمهتی دانی په نابهرانی کورد دا بهدی ده کری .

نوینهرانی حکومت بیر پرا و پهنیازی نوینهرانی فیدراسیون یان یادداشت کرد و پرایان گهیا که سهارهت به وه زعی کورده کانی دانیشتویی سوید گرتگی زور ددهن به کاروخه باتی فیدراسیونی کومه له کانی کوردستانی له سوید و پیمان خوشه زوو به زوو چاویان به نوینهرانی فیدراسیون بکهوی .

فیدراسیون کومه له کانی کوردستانی له سوید بو ناساندن و پروون کردنهوی بهرنامه ی کاری خوئی بو کاره دستانی سویدی پرۆزی ۱۵ سیپتامبر له خانووی فیدراسیون کوپوننومیهکی بو ئەوان پیک هیئا .

له کوپوننومه که دا کومه له کانی ئەندامی فیدراسیون : کومه لهی کورد له ستوکه پۆلم ، کومه لهی کوردستانی له سپونگا و کومه لهی زنانی دیموکراتی کوردستانی له سویدیش به شدار بوون .

ئهو کوپوننومه له دوو بهش پیک هاتبوو . له بهشی یه کهم دا له لایهن فیدراسیون و کومه له کانی پرا ئاگاداری درا به میوانان و له بهشی دووههم دا کاره دسته سویدی یه کان زانیاری یان هیئا په گورپی .

له بهشی یه کهم دا سهرۆکی فیدراسیونی دوا ی به خیر هیئانی میوانه کان به کورتی باسی وه زعی کورده کانی دانیشتویی سویدی کرد ، هوئی هاتنی ئەوانی بو ئەم ولاته

شی کردهوه و میژووی هاتنی ئەوان وههوی که له چ مهلبهند و ناچهیهکی کوردستانی پرا هاتوون باسی کرد . ههر وهها ئەهوشی هیئاگورپی که کاری ریکخستنی کورده کان

له سهره تاوه چونی ده ستپیکردوه و ئیستا له چ پلهیهک دایه و باسی پیک هیئانی فیدراسیونی پرا بردوو و ههرووشی کرد . سهرۆکی فیدراسیونی له کوتایی قسه کانی

خوئی دا سهارهت به بهرنامه ی فیدراسیونی دوا و پروونی کردهوه که تا کوو ئیستا فیدراسیون چی بو مندالان ، ژنان ، لاوان و په نابهرانی کوردی دانیشتویی سوید کردوه و بهرنامه ی چیه و دیهوی

چ بکا .

دوا ی قسه کانی سهرۆکی فیدراسیون نوینهرانی کومه له کانی ئەندام له سهر وه زعی خوئیان دوان و بهرنامه کانی خوئیان پراگهیا و گیرو گرفته کانی خوئیان سهارهت به یارمهتی یه کانی کومونی ستوکه پۆلم هیئاگورپی .

له بهشی دووهمی کوپوننومه دا ، نوینهرانی ده سهلاته جوړ به جوړه کانی سویدی باسی کار و باری خوئیانیان کرد و پرنسیپی یارمهتیدانی کومه له کومه لایهتی یه کانیان پروون کردهوه .

له کوتایی دا ههر دوو لایه پرسیاره کانی خوئیان هیئاگورپی وهو چه شنه کوپوننومه که دوا یی هات .

میوانه سویدی یه کان پرایان گهیا که ئەو کوپوننومه بو ئەوان زور به کهک بووه و پرنسیپی زور له کاروخه باتی فیدراسیونی تازه دهگرن .

ئهو ده سهلات و داوو ده زگایانهی که نوینهرانی وان لهو کوپوننومه دا به شدار بوون بریتی بوون له :

ده زگای ده ولهتی کاروباری کوچهران ، شوورای ده ولهتی فرههنگ ، نهیستیتووی ده ولهتی کهرستهی خویندن ، شوورای ده ولهتی لاوان ، ده زگای کاروباری کوچهران له ستوکه پۆلم ، ده زگای کاروباری کاتی ئازاد له ستوکه پۆلم ، کومیتیهی

فرههنگی کومونی ستوکه پۆلم ، پیکخراوی ناوهندی خویندکاران له ستوکه پۆلم ، شوورای کومه لان له سپونگا ، ده فتهری په نابهران له ستوکه پۆلم .

به شیک له وتاری سه روکی فیدراسیون
به بونهی هیرشى فرۆکه کانی پزیمى
تورکیا بو سه رخاکی کوردستانی

تهوړو ئیمه لیږه کوووبینه تهوه بو تهوهی
دهنگی بیزاری خوومان دزی پزیمه
کوڼه پرسته کانی عیراق و تورکیا بهرز
بکینه هوه .

د میان ساله که ټهو پزیمانه د میانهو
بزووتنه وهی نه ته وایه تی کورد تیک بشکین .
به لام چ جاری ټهو ویسته ی ټهوان
وه دینه هاتوه ، چونکو بزووتنه وهی
نه ته وایه تی کورد تادی پره گرتد بستی
و پشتیوانی هیزی خه باتکار بهر وه لای
خوی پاره کیشی . دوزمن له وه گه شتوه
هر بویه شه روژ به روژ هیرشى خوی
زیاد تر دهکا .

له روزانهی دوا یسی دا هیرش وه لا -
ماری دوزمنه وحشی یه کلمان گه شته
ټهو پهری خوی . روژی ۱۵ سیپتامبر
فرۆکه ی شهر یسی هیزی هه وایسی
تورکیا هیرشیکى گهور میان برده سه
کوردستانی باشوور و نه وییان بومباران
کرد . ټهو بومبارانه روژی ۱۶ و ۱۷ ی
سیپتامبر پزیمى دزی هه وو .

پزیمى فاشیستی تورکیا ، ټهو هیرشه
وحشیانه یه له چارچیوهی په یمانه ک
دا دهکا که سالی ۱۹۸۲ له نیوان
تورکیا و عیراق دا ئیمزاکرا . بیگومان

په یمانی ټهوتو دزی په یمان وړنگه وتنی
ناونه ته و میسون که مافی گه لان ده پاریزن
و دسته بهریان دهن ، تنانه ت پریک
له و په یمانانه له لاپهن تورکیا و عیراقیش
پرا ئیمزاکراون . به لام حکومتی
ټهو ولاتانه هه میسه په یماننامه
ناونه ته و میسی کان پیشیل ده کهن .

حکومتی تورکیا له راگه یاندراوی خوی
دا ټاشکرای کرد که ، کووژرانسی
۱۲ کس له نیزامی یه کانی تورکیا
بوته هوی ټهو هیرشه . به لام له
راستی دا نه خسه ی ټهو هیرشه
له ۲۵ مانگی ژووتیه را کیشرا بوو .

ټهو مهسه له یه له لاپهن جیگری
سه روکی حیزسی گه لی سوسیال
دیموکرات ، ته و فقی چاقدار وه پروو
کهوت . هه لیه ت شیاوی باس کردنه
که سوسیال دیموکراته تورکه کان دزی
ټهو هیرشه نه بوون ، رخنه ی ټهوان
له حکومت له بهر ټه و میه که له پیشدا
ټاگادار نه کراون ، و ټه مه خوی چلونان -
یه تی بوچوونی حکومتی تورک و به ناو
هیزی ټوویزیسیون له سه مه سه له ی
کورد نیشان ده دا . ټهوان ده یانه وی

هه رچونیکى بستی بزووتنه وهی نه ته وایه تی
کورد تیک بشکین و به و پریگایه دا له
روژه هلاتی ناوه راست دا بو سیاسه تی

کوڼه پرستی که ټهوان نوینه رایه تسی
ده کهن ټالوگوپیک پیک بهینن . له لای
دیکه وهش ده یانه وی هیزی شو ونیست
و په گه زه پرست له ده وری خو کوڼه نه وه
و هیزه دیموکراته کانی تورکیا له ناوهرن .
ئیمه به شادی به کی زوره وه پاره -

گه یه نین که سه روکی لیبی ، موعه مه رفه ززافی
به توندی دهنگی بیزاری خوی به رامهر
ټهو هیرشه بهرز کردو ته وه ، به لام به داخه وه
هیچ حکومتیکى دیکه سه باره ت به و
کارساته ئیعترازی نه گرتوه . لیږه دا
را ده گه یه نین که حکومتی سوید ، که
هه میسه دزی زورداری هه لو یست ده -

گری و پاریزگاری له مافی مروف ده کا
له و بار میه وه دهنگی لیوه نه هات . ئیمه
هیوادارین که حکومتی سوید هه ر
وا بیده نگ نه مینسی .

ئیمه به توندی دزی تیروزی حکومتی -
ته کانی تورکیا و عیراق ئیعترا ز
ده گرین و داوا له هه موو هیله
دیموکرات و پیشکه وتوه کان ده که یین
که دزی تیروزی فاشیستی به پرسیایه تی
خویان به جق بهینن .

- بمری فاشیزم !
- بمری کولونیالیزم !
- بزى بزووتنه وهی گه لسی کوردستانی
له پینا و نازادی دا !

شاکلاری

فیدراسیونی کوڼه له کانی کوردستان له سوید ، لیژنه یه کی
داسه زرانسه وه بسو په نا به ران
شه و لیژنه یسه خه ریسکی کسار و بساری په نا به ره کانی کسورده له سوید .
هه قالیک بو ټه م کازه ترخان کساره ، هه ر هه قتمی دوو جبار ، روژانسی
دوو شه مسه و سسی شه مسه له کاتزمیر ۱۴ - ۱۷ له فیدراسیون پیشه وازی په -
نا به ران دهکات .

به خیر هاتسن له هه سوو په نا به ریسکی کسورده نه که یین ، هه موو
لا یهک به خیر بین .

